


WELAT

Hunerja mîkantîti wî şerî re
mabû temâşevan...

m

in di dest-pêka filmê de dixwest ku ew çavkaniyên lazim e di xizmeta gel de bin, bi çi awayî di vî şerî de berhe-wa dibin, li ber çavan eşkere bikim. Ji bo vê jî çekêni mîna top, tank û helikopter lazim bûn. Ev çek li ba kê peyda dibin? Li ba leşker û polîsan. Me ji leşkeran daxwaz kir, lê gotin: "Ku em senaryoyê bipejirînin, emê alîkariyê bikin." Dû re ji produkторê me re gotibûn: "Hûn nikarin sûbayekî tîrkan bikin emsalê terorîstekî PKK'ê û sûbayekî tîrkan ji kur-dekî re serê xwe natewîne, jê re ffade nade. Ku hûn di vê daxwaza xwe de israr bikin, wê rê li pêsiya we bêne girtin..."

Rûpel 8-9



- "Di şer de qonaxeke nû: Erişen İntixarı" SAMÎ BERBANG di vê nûçe-şiroveya xwe de li ser sedemên van şalakiyan û helwesta rayedarên tîrk disechine Rûpel 3
- Çawa caşen ku rahiştine tîvingê û li hemberî azadixwazan şer dikin hene, a wisa yêngî çanda kurdî jî hene. AMED TÎGRÎS bi nivisa xwe ya "Xwefiroş û kulturfiroş" balê dikişîne ser vê mijarê Rûpel 7
- "Makyavelîzma humanist" MAZHAR GÜNBAT bi vê nivisa xwe pirsên "Ji bo me ronesans pêwist e an na? Kijan ronesans? Li Ewrûpayê ronesans pêk hatiye an na?" jî nîqaşê re vedike Rûpel 6
- FAYSAL DAĞLI bi navê "Li Kolnê tango!" li ser helwesta rewşenbirênd kurd radiweste Rûpel 13

NAVEROK




4

Nazhat Azîz Surmê:
Peywendiyen kurdî û sumerî



7

S. Mirdêsi:
Pirsa rewşenbîriyê



10

Dildar Şeko: Ji amûrên fûkirinê
Baleban, duzele û bilûr

Ji Xwendevanan

JI Televîzyona MED'ê re...

Bi hezar salan e gelê Kurdistan di bin desstan de ye. Vê pêvajoya ku em di têde ne, têkoşina rizgariya Kurdistan gîhiştîye merhaleyeke berz û biliñd û bi awayekî lez ber bi serkeftinê ve diçê.

Di vê demê de rola ku televîzyona MED dilîze û listiye, ji me ve eyan e. Ji mercen netewyan yek jê pêkanîna yekîtiya çand û siyasetê ye. MED iro ji bo vê yekê roleke girîng distîne.

Ji ber vê rola girîng, dijminê gelê kurd, bi kedxarêñ din ve li ser sekinîn ku dengê Kurdistanê qut bikin. Lê belê careke din derkete holê ku ew çiqas li ser bisekinin ji, nikarin vê kaniya jiyanê bîmîciqînin.

Beyî MED-TV nameşel!

DILÊN PKK'YI/GIRTIGEHA UMRANIYE

IRO em lê dinêrin ku li welatê me û li Tirkiyeyê gelek saziyan me kurdan hene. Hebüna wan saziyan me gelekî kîfxweş dike. Saziya me ya ku di warê çand û hunerê de herî bi nav û denge Navenda Çanda Mezopotamyayê (NCM) ye.

Vê saziya me şaxe li Mêrsinê vekir, ez gelekî pê kîfxweş bûm, min divê xebatê hanê bidomin. Bi dîtina min di xebatê NCM'ê de kîmasiyek heye, ew jî venekiri na şaxe li Enqereye ye.

Ji bo hisyarbûna gelê me li vî bajarı ji divê şaxeke NCM'ê vebe. Ji xeynî vê dîlxwaziyê me divê rojnameya me jî pir xurt bibe, da ku gelê me hin zû hinî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibe.

NAVXWEŞ EYNÊ/ENQERE



A ku fîlm filitandiye helwesta wê ye

MEHMET GEMSİZ

Em ji medyayê pê hesiyan ku filmek tê kişandin, bi navê "İşıklar Sönmüşün" (Bila Ronî Netemirin). Di nûçeyan de dihate eşkerekirin ku mijara film li ser "lihevxitinê li Başûrê Rojhîlatê Anadolê" ye.

Navê derhêner û senarîstê film (ligel Cemal Şan) Reis Çelik ji me re nas nedihat. Jixwe ev filma wî ya pêşin bû. Lîstikvanê sereke (Berhan Şimşek û Tarık Tarcan), çendî ji me re ne biyan bûn jî, dibûn sedem ku em der barê filmê de bikevin gumanan. Ji ber ku kadro zêde ne navdar bûn û heta niha em rastî daxuyaniyeke wîn, helwesteke wan a li hemberî şerî qirêji nehatibûn. Rejisör, aktor, aktrîs, bi kurtî mezîn û giregirîn sînemaya tirk ên pesverû tê de ne xuya bûn...

Gumana me ya mezîn ev bû; me texmîn dikir ku wê filmeke "alelade" bê kişandin, hem jî bi zihniyetâ Ertürk Yondem.

Bere bere em ji vê gumana xwe filitîn. Çarek aktorekî wekî Tunçel Kurtiz jî di "Bila Ronî Netemirin" de rol distand. Dihat gotin ku filmeke bêaliye û wê bike ku pir li serê bê xebardan.

Ew roja ku em li hêviyê bûn hat. Film êdî li sînemayan dihate nîşandan.

Ji rojnameyê, hevalê me Rahmi Batur bi derhêner û senarîstê film re hevpeyvînek pêk anî. Ev hevpeyvîn, çîrok û serpêhatiya vê filmê ji me re vedibêje. Me ew ji xwe re kire manşet.

Digel vê yekê ez jî çûm temâşeya wê. Vê jî bibêjîm: Em jî yekemîn car li ber deriyê salonê

ji aliye wezifedare sînemayê ve hatin sekirin (oxilmekirin), di çûna yekemîn filma tirk a ku meseleya kurdan ji xwe re kiriye mijar. Ji ber çi ev yek qewimî, êcli hûn texmîn bikin.

Der barê vê filma hanê de ez dixwazim çavdîriyê xwe binivîsim:

Di destpêka filmê de findek (mûmek) pêxisitî tê nîşandan, ku li ber tefinî ye. Ji nişka ve dest xwe jê re dikine stare û nahêlin roniya zê-nûn (zelûl) bitemire, wê geş dikin. Pişt re mînbuseke Gund xuya-dibe, ji nişka ve komek gerîla, ku di bin fermandariya Seydo (Berhan Şimşek) de ne, divavêjin pêşîya mînbûsê û riya wê digirin. Rêwiyan jê peya dikan û yekî cerdevan (qorîcî) dikujin.

Di bin fermandariya, Yuzbaşî Murat (Tarık Tarcan) de ji komek leşker, ji bo girtina "terorîstan" tê wezifedarkirin. Pêşî-Yuzbaşî Murat diçe gundê kuştî ji bo serxweşiyê û dû re jî di-de pey koma gerîla.

Li çiyê, Yuzbaşî Murat rê li ber koma gerîla digire. Dest bi lihevxitinê dikin. Ji ber teqîna şer, şepêya (aşita) bérfe bi ser herdu aliyan de tê û tenê Seydo, Yuzbaşî Murat û gerîla Zozan (Sermin Karaali) şax dimînîn, lê Zozan-bîrîndar e.

Seydo û Zozan li şikeftekê dikevine destê Yuzbaşî Murat. Wan dide pêşîya xwe, ji bo radestkirina wan. Di rê de Zozan dimire. Yuzbaşî û Seydo bi tenê dimînîn. Pişt re Seydo ji destê wî xwe difilitîne, tê gundekî xerakî. Yuzbaşî Murat li gund dîsa wî digire, li hev dixin, di

vê navê de kesekî kal (Tunçel Kurtiz) tivinga xwe i herduyan jî rast dike.

Didezanîn ku ji wî pê ve (digel neviya xwe Dîlan) kes li gund nemaye. Lî wî dev ji axa bay û kalan bernedaye. Ew hezar sal e li vir e û wê ew qasê din jî bimîne.

Kesên çekdar (nayê zanîn ku ew kî ne) bi ser gund de digirin. Kalo tê kuştin. Neviya wî ber bi termê wî ve gavan radihêle. Gerîla Seydo û Yuzbaşî Murat baz didin, her yek ji wan bi milekî Dîlan digirin bilind dikan û wê ji ber guleyan direvinin.

Finda ku di serê filmê de tê nîşandan, di da-wiyya filmê de dibe Dîlan, ronî êdi Dîlan e.

Film ji aliye hunerî ve, ji min re wasat hat. Senaryo pir basît e û mantikeke hevgirtî tê de nîn.e. Termînolojiya ku gerîla bi kar tînin, ji heqîqetê gelek dûr e. Kostüm jî her wisan in.

Nêziktîdâna leşkeran bi gel re bi nazikî û ya gerîlayan (çaxa ku mînbûsê didine sekinandin) serî e. Bealîbûn, bi ya min di vir de bi eşkerî hatîye îhlalkirin, digel ku di vî wař de film zêde bi ser neketiye.

Zêmara ku li ser mirina Zozan tê strîn, "Xezal Xezal" a bi nav û deng e. Qet li dîmenê nayê. Ew straneke evînî ye, ku tê de gotinê wiha jî hene: "De rûkê Xezala mîn sor bûne ji çîrk û maça lo lo... ramûsuna.."

Kurtbûna diyalogan, ez bi xwe, baş û di cih de dibînim. Temâşevanan didine fikirandin.

Gotinê kalo baş û bi mane ne. Jixwe, bi giştî mesaja filmê li vir pir derketiye pêş.

Helwesta filmê, di vê rewşê de, baş e. Di warê sînemayê de ew dibe destpêkera lihevte-qandina meseleya kurdan. Lî, lihevteqandine-ke nerm û bi fikar e. Ez wisa difikirim ku piçekî din jî bi wêrekî bi ser wê "tîrsonek"iya xwe de biçûna wê hîn bêhtir film baş bibûya.

Yekîtiya nîvîskaran hêzeke dîrokî ye

M. ROJEN

Di van her çend mehîn dawîn de yeko yeko sazî û dezgehîn pîseyî yê kurdî hatin damezirandin. Bêguman pêwistîya sazî û dezgehîn wilo di rîbûwariya komelayeti û bêrpêçûna neteweyî de gavên bingehîn in. Pêwist in!... Di hûnandin û avakirina civakî de rola stêwhandin û pişkivandinê dilizîn. Helbet xwedî derketina li paşeroj û pêşerojan ji di nava vê hûnandinê de cih digire. Gelê bêfîraze, ji dîroka kevnar, dûr û kûr, ji çand û wêjeya dirêj û fireh bêpar e!... Tu gelên cihanê bêdîrok, bêçand û wêje tune!.. Lî, wekî ku em di serpêhatî û jîyana gelê kurd de dibînin, dewletê serdest, xwedî hêzên zorê, dest datînin ser her wateyî û her nîrxên komên xelkê.

Di nava bê şermiyekî mezîn û derî mirovaniyê!...

Piştî pir bedelîn mezîn ku gelê kurd li ser lingê xwe rawestiyaye, êdî dikare xwedî li xwe derbikeve, di qonaxa ku iro di rojeva cihanê de dora yekemîn distîne, destê xwe avête avaniyên neteweyî. Yek ji van avaniyân Yekîtiya Nîvîskarêñ Kurdistanê ye ku di 12.10.1996 an de li bajarê Kolnê hate damezirandin. Bi têkiliyên komîteya rîveber ku bî mehan karûbar kir, civîna yekemîn hate amadekirin. Komîteya rîveber dema civîna xwe ya pêşî li Neus, Akademiya Kurdi kir, bîrîvara 21'ê sermawezza 1996'an dabû. Helbet şert û surûtîn Ewrûpa û ditina sa-

Tiştê herî hêja ev e ku prosedûra fermî di nava kurdan de jî tê pêkanîn. Bi besdariya serokê PKDW'ê û serokê sazî û yekîtiyan, di vê civînê de posedûra fermî pêk hat. Helbet ji bo me tev dilşahiyeke mezîn û hêviyeke pêşerojan e..

lonêñ civînan bîryaren mîrov diguherînin. Bi vê pêwanê roja civînê kete rojê pêş... Lî careke din dema ragîhandin û agahdariya nîvîskaran hebû. Mixabin di daxuyaniya rojnameyê de cewtî û xeletiyen mezîn hebûn. Lî daxuyanî ji bo ragîhandinê, navnîşan û armanca civînê bes bû. Gerek e nîvîskarêñ Kurdistanê qesta vê rojê û civînê kiribûne. Yekemîn car bû ku yekîtiyeke pir hêlî û her çar parçeyen Kurdistanê parvekirî berhem-bêz dîrok, dihate damezirandin. Careke din mixabin besdar ne li gorî dîlxwaziyê bûn!... Ji Almanya, Belçika, Fransa, Danîmarka, İngilistanê nîvîskar hatibûn.

Her wiha rojname û televîzyona MED'ê jî amade bûbûn. Li hemberî hejmara besdaran a hindik, mesaj pir ji kes û saziyan, ci akademik, ci politîk hatibûn. Nîvê wan, yanî mesajen hînek kesen bi nîrx û saziyan çandî hatin xwendin, ê din ji, ji sedema demê bi nav hatin xwendin.

Tiştê herî hêja ev e ku prosedûra fermî di nava kurdan de jî tê pêkanîn. Bi besdariya serokê PKDW'ê û serokê sazî û yekîtiyan, di vê civînê de posedûra fermî pêk hat. Helbet ji bo me tev dilşahiyeke mezîn û hêviyeke pêşerojan e... Wekî her kesî mafê gelê kurd jî di rîkû-pêkiyê de heye. Bi rîexistinî û hûnandinâ

civîkî mayîna li ser lingan heye. Xwedî derketina li stana xwe, li dîrok û wêjeya xwe bi avaniyên neteweyî heye. Piştî gi-hîna vê qonaxê ku pir bedel dane, kes nikare vî mafî ji desten gelê kurd bigire. Mafekî bi ked, têr xwêdan û xwîna neqam e!...

Piştî axaftinê mîvanan, armanca civînê wekî her destpêkê di wateyê pêşerojan de û berhem-bêztiya giştî, nêzîk ne dûr bi besdariyeke pirhejmar a her parçeyen Kurdistanê, hate diyarkirin. Civîn di eyîn rojê de bi hilbijartina heyeta idarî ku ji heft kesan pêk hat û sê kesen çavdî qediyi.

Yekîtiya Nîvîskarêñ Kurdistan saziyeke dîrokî ye. Pir hêvî û daxwazên mezîn jê têne xwestin. Gelê kurd di qonaxêke pir nazik û nazenîn de ye!... Helbet binbâriya her sazî û dezgehîn neteweyî heye, lê binbâriya nîvîskaran bêhtirî her kesî ye. Ji ber ku ev avanî ji her pîseyî, ji her sazî û dezgehîn mîrovan berhem-bêz dike. Di warê berhem û têkiliyan de, di warê civîn û ziman de, di warê weşan û bultenan de, di warê werger û çapemeniyê de divê ku rola xwe bilize!... Ya herî girîng ew e ku pêwistîya gavên fireh, pîrhîli bavêje, teng mijûl nebe, ji bo ku bikaribe rola xwe ya mezîn bilîze.



XELATA Lîşa Navneteweyî ya Mafêni Mirovan ji malbatê windahîyan re hate dayîn. Ev xelat bi navê "Madalyonê Carl Von Ossientzky" li Almanyayê tê dayîn. Seroka Koma Keskan a Parlamento Ewrûpâye Claudia Rothê bi daxuyaniyekê, digel këfxweşîya xwe, ev bîyar diyar kir. Claudia Roth der barê sedema dayîna vê xelatê de ji bo malbatê windahîyan jî ev got: "Em dixwazin bala raya gitî ya navneteweyî bîkişîn rewşa mafêni mirovan a li Tirkîyeyê."

Seroka Koma Keskan a Parlamento Ewrûpâye da zanîn ku ji her demê zedetir pêdîviya mafparêzen Tirkîyeyê bi piştgiriya navneteweyî heye.

DIK

Hêstirêن çavan û vîna mirovan

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Al) li Stenbolê ji bo mafêni mirovan rûnişt.


Malbatê windayan (Dayikên Şemiyê) di 26'ê kewçêrê de dîsa li ber Lîseya Galatasaray civîyan û wekî her carê rûniştin. Lê ferqekê vê rûniştinê ji yên berê hebû, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Al), bîyareke gitî girt ku endamên wê bi awayekî fermî besdarî rûniştina Malbatê Windayan ên Stenbolê bibin. Rêxistinê Efûyê xwest ku, bi vê yekê hem bala dewletan bi taybetî ya dewleta tirk, hem ji bala gelên dînyayê bîkişînser vê mijarê.

Berî rûniştinê di rojnameya Ewrûpâye Independentê de jî îlaneke wekî "Hêstirên çavan nikarin windayêni li Tirkîyeyê bi şûn ve bînin, lê hûn dikarin" derketibû. Heyeta Rêxistina Efûyê û gelek mafparêzen vir piştî rûniştinê jî li BILSAK'ê civînek ji bo çapemeniyê li dar xistin. Li wir nûneren Al'yê der barê rewşa Tirkîyeyê de dîtinê xwe diyar kirin û li ser kampanyaya ku li dijî Tirkîyeyê tê meşandin agahî dan.

Heyeta Al'yê dixwest ku li ser problema binpêkirina mafêni mirovan, ji berpirsên wî karî, Wezirî Edaletê Şevket Kazan re hevidinekê çêbike, lê ji ber nexwestina Kazan negîhiştin armanca xwe. Ev ji nîşan dide ku berdewamiya binpêkirina mafêni mirovan û windakirina kesen muxalîf hê jî di rojeva me de ye.

Divê êdî bê zanîn ku tu zagon û bîyar bi serê xwe û bi zora îradeyêne dewletêne derve bi cih nabin. Dema ku daxwaza guhertinê di mîjiyê însanêvir de bi cih bibe, wê çaxê dê rewş biguhere.

DÜZGÜN DENİZ



KOMİTEYA Parastina Rojnamegeran (CJP) yek ji "Xelatê Azadiya Çapemeniyê" da rojnameger Işık Yurtçu. Komîteyê diyar kir ku ew vê xelatê didin kesen ku di warê parastina serelayen rojnamegeriyê de fedekarî kirine û li dijî sansurê li ber xwe dane.

Işık Yurtçu ji ber Berpirsîla Karê Nivîsan a Özgür Gündem, bi 15 salan hate cezakirin û niha jî li Girtîgeha Sakaryayê dîmîne. Ji bili Yurtçu, 3 rojnamegeren din şayanî (laiiqî) vê xelatê hatin dîtin; yek ji wan filistînî, yek meksîkî û yek jî hindistanî ye. Rêveberê CJP'ê William A. Orme da zanîn ku xelatgirên ısal, rewşen ne-asayı de karê xwe kirine û rûmeta rojnamegeriyê parastine.

NÛÇE

Di şer de qonaxeke nû: Êrîşen ïntixarı

**Di salvegera 73'yan a
avabûna komara tirk de li
Sêwazê gerîlayeke ARGK'ê di
canê xwe de bombe teqand.
Çar rojan berî vê jî li Edene
çalakiyeke bi vî rengî pêk
hatibû. Bi van çalakiyan şer
kete qonaxeke nû.**

Li gorî gotineke pêşîyan, "mirov çi biçîne, wê wî biçîne". Hefteya çûyî êrîşen ïntixarı yên gerîlayen ARGK'ê ev gotin anî bîra gelek kesan.

Piştî agirbesta PKK'ê, hînekî nûçeyen kuştin û pevçûnan kêm bûbûn, lê dewletê guhê xwe nedâ vê banga aştiyê û doza qirkirina gerîla kir. Li ser vê yekê livbaziyan ARGK'ê yên berevaniyê (xweparastin) dest pê kirin.

Roja 1'ê tîrmehê çalakiya ïntixarı ku ji mîj ve qala wê dibû, li navenda bajarê Dêrsimê pêk hat. Di vê bûyerê de digel vê gerîlaya bi navê Zeynep Kînacî ango Zilan, li gorî daxuyaniya fermî 9 leşker mirin, gelek jî birîndar bûn.

Piştî wê, hêzên dewletê ji her alî ve kuştinê xwe domandin, 12 girtiyen siyasi di rojiya mirinê de can dan, 11 girtiyen PKK'yi li Girtîgeha Amedê bi lêdanê hatin kuştin û gelek kuştinê din. Her wiha ji bo protestokirina vê qirkirinê du girtiyen xwe şewitand, lê dîsa deng ji kesî derneket.

Roja 25'ê kewçêrê gerîlaya bi navê Leyla Kaplan li Edene li ber deriyê Fermandariya Hêzên Çalak (çevik kuvvet), bombe di bedena xwe de teqand û tevi wê, sê polîs û mirovekî sîvîl mirin.

Li dû vê bûyerê içar di salvegera 73'yan a avabûna komara tirk de li Sêwazê gerîlayeke ARGK'ê di canê xwe de bombe teqand. Di vê bûyerê de jî di gel wê (Güler Otaç-Bermal), gerîlayekî din, sê polîs û mirovekî sîvîl mirin.

Di heman rojê de li Qulpâ Amedê leşkeren tirk ketin kemîna gerîlayen



Zaynep Kînacî (Zilan)



Leyla Kaplan (Rewşen)



Güler Otaç (Bermal)

ARGK'ê, li gorî daxuyaniya fermî 14 leşker mirin, 10 heb jî birîndar bûn.

Ji bo fêmkirina sederna van çalakiyan divê mirov gotinê Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ên bi rengê, "Heke hewce bike, wê her kurd bibe bombezek û li dijmin biteqe" bîne bîra xwe. Ji xeynî vê jî divê mirov tengasiya ku niha gelê kurd tê de dijî, bîne ber çavan.

Ji bo diyarkirina rewşa gel, divê qala du nivîsêni ku di rojnameyên tirk de cih girtin, bê kirin. Yek ji wan çavdêriyên heyeta CHP'ê ya li ser rewşa Dêrsimê ye.

Li gorî daxuyaniya vê heyetê ku roja 25'ê meha kewçêrê bi civîneke çapemeniyê hate diyarkirin, jî 417 gündê Dêrsimê 287 heb jê, ji kewçêra 1994'an û bi vir de ji hêla hêzên dewletê ve hatine valakirin; mirov di rewşeye gelekî xerab de ne, cihekî ku lê bîmînin tune, ji ber ku kar bi dest nakeve bi birçînê re rû bi rû ne.

Her wiha hêzên dewletê, nemaze jî timen taybet (özel tim) ji ber ramanen xwe yên nîjadperest zilmê li gel dikin. Li aliye din ambargoya li ser gel, rewşeye xerabtir dike...

Mînaka din ji Amedê ye. Nivîskarê rojnameya Turkish Daily Newsê Yusuf Kanlı roja 25'ê kewçêrê çavdêriyên xwe vedibêje: "Diyarbekir wekî welatê polîsan e, mirov her tim li pişt xwe bi hilma polîsên sîvîl dihese. (...) Koçberen ku li gundêne xwe xwedîyê kareki û dahatûyekê bûne, niha bi temamî bûne komeke berxwer û betal ku heta deme-

ke xuyanî jî nikarin bibin hilberîner."

Yusuf Kanlı cih dide hin dîtinêni mirovîn li herêmê. Gel giliyan li sisteme cerdevaniyê dike û bi bîr dixe ku polîs, serlesker û karmendêni li vê herêmê şes qafî ji hevpîseyen xwe yên li herêmê din pereyan distînin. Piş re tê gotin ku, ji ber vê rewşeye şer zû bi zû naqede.

Li aliye din, daxuyaniyên rayedarên tirk ên piştî van bûyeran didin der ku ew hê li ser riya xwe ya berê ne. Roja 30'ye kewçêrê beyaneke Serkanê Giştî yê Artêşa Tirk Ismail Hakkı Karadayî di rojnameyên tirkan de hate weşandin, ew dibêje: "Em karin terorê di nava sê mehan de biqedînin, lê demokrasî rê nade."

Hefteya çûyî digel êrîşen ïntixarı, civînê aştiyê yên hêzên başûrî jî di rojê de bûn. Heyetê PDK û YNK'ê digel Cigirê Wezirê Karê Derve yê Amerikayê Robert Pelletreau, nûneren Ingilistan û Tirkîyeyê û tirkmenan roja 30'ye kewçêrê li Enqereyê li hev rûniştin.

Li vir jî daxwaza dewleta tirk a sereke ev bû ku bi hêzên kurd dijminatiya PKK'ê bide kirin, angó wanbiajo ser hêzên ARGK'ê. Her wiha daxwazeke din a dewleta tirk jî girtina Kampa Et-rûşê bû.

Weki encam gotinê serkanê giştî yê tirk û daxwazên dewleta tirk a ji kurden Başûr, diyar dikin ku wê ew şer gurtir bidome û gelek mirovîn din jî bîn kuştin.

SAMÎ BERBANG

Peywendiyên kurdî û sumerî

Zimanzan di xebatêن xwe yên rûberî de nekarîne zimanê sumerî bigihînin tu malbatêن zimêن ên îroyîn. Bi tenê karîne behsa pêpelûkên geşedana wî zimanî bikin. Ew diyar dîkin ku sistema kevnare bi riya sazkirina wêneyan hatibû çêkirin.

Paşê sembolan, xêzan cihê wêneyan girt.

NAZHAD AZÎZ SURMÊ

Berdestiyêن arkeolojik jî diselminîn ku gelê li bakur û bakurê rojhilate herêma ku jê re Iraqê tê gotin, ji ber hinek bûyerên surîstî û gelhejmarî (demografîk) berdewambûna jiyana mirovahiyê gengaz kirîye.

Ev yek bi berdestiyêن piştî serdema demaniyê jî zêdetir diyar bûye. Nema ze berdestiyên têkildarî gundê çandînî vê hêrikîna domdar destnîşan dîkin.

Piştî ku hinek mîneral bi dest ketin, serkeftinê mezîn derketin ronahiyê. Ew bernîsaneyê şaristaniyeke yekgirtîne, berî afirandina sistema nivîsa ya 6 hezar sal berî niha bi destê sumerîyan pêk hat. Afirîna sistema nivîsandînê guherînê pir mezîn ên çandî bi xwe re anîn. Kifşkirina nivîsê ji bo qeydkirina aliyêن cur bi cur ên jiyana gelan û civakêن qedîm bû alîkar. Bêyî nivîsê, li ser jiyana civakên seretayî yên di destpêka dîrokê de bîdestxistina agahiyan wê geleki dijwar bûya.⁽¹⁾

Dibe ku mirovîn civakên seretayî bi zimanekî peyivîbin, lê piştî afirandina nivîsê dest bi nivîsandîna raman û hes-tênen xwe kirîbin. Nivîskarê kevnare ku tekstên nivîsên wan di dest de hene, xwe wekî dûvajoyê raboriyeke pêşketî di nava aşîf û dewlemendiyê de didîtin.⁽²⁾

Ziman, diyardeyeke çandî ya jîndar e ku wekî jiyana mirovan diguhere. Dr. Cemal Raşîd di pirtûka xwe ya bi navê "Lingistic Study of Kurdish History" (Lêkolîna Dîroka Kurdî ya Zimanî) de dide zanîn ku ziman wekî diyar-deyekê diperise û diguhere li gorî dem, cih û şeweyê jiyanê. Lewre mirovan kare bibêje, ziman bi sê riyan derketiye holê:

1) Di destpêkê depêwist e zimanekî

kesanî hebe ku hinek endamên diyar ên şaxê eşîrê pê dipeyivîn. Dema ew şax jî eşîrê vejetîn, têkiliyê xwe jê qut kîrin, tevî hinek kes û komikêni ji eşîrê din bûn, bi vî rengî zarava derketin hollê. Paşê her yek ji van zaravayên komêni ku karibûn jiyana xwe berdewam bikin, bû zimanekî serbixwe.

2) Ji ziman zaravayên cur bi cur pêk anîne ji ber hinek sedemên taybet ên si-yasî û leşkerî.

3) Hinek ziman û zarava bi geşedana hinek olên pîroz wekî zaravayên wan ji yên din vejetîn.

Tevî ku binyada sumerîyan hîn mi-jara nîqaşê ye jî, ew wekî avakarên yek ji şaristaniyê kevnare dimînîn.⁽³⁾

Dîrokzan, arkeolog, zimanzan ên ku bi taybetî li ser zimanê kevnare pispor in, diyar dîkin ku sumerî ne qewmekî semîtik e. Piraniya çavkaniyên pêsel-mîn, vê rastiyê destnîşan dîkin. Wek mînak nivîskarê berhemâ bi navê "The Story of Civilization" (Çîroka Şaristaniyê) Will Durant, nivîskarê "The Ancient Iraq" (Iraqa Qedîm) George Roux, nivîskarê "The Conquest of Civilization" (Zeftkirina Şaristaniyê) James Henry Bristid û kesen wekî Henry Frankford, Henry Sakiz, Samuel Crimorê ku li ser çand û dîroka sumerîyan lêkolînê dike. Her wiha hê gelek lêkolîner, arkeologên erek wekî nivîskarê pirtûka "An Introduction of Ancient Civilizations" (Destpêkeke Şaristaniyên Kevnare) Taha Bekir û zanyarên mîna Dr. Fadîl Abdul-Wahîd, Dr. Fewzî Raşîd di lêkolînê xwe de qala vê rastiyê dîkin.

Zimanzan di xebatêن xwe yên rûberî de nekarîne zimanê sumerî bigihînin tu malbatêن zimêن ên îroyîn. Bi tenê karîne behsa pêpelûkên geşedana wî zimanî bikin. Ew diyar dîkin ku sistema kevnare bi riya sazkirina wêneyan hatiye-



Figure No. 1

dîrokzan, arkeolog, zimanzan ên ku bi taybetî li ser zimanê kevnare pispor in, diyar dîkin ku sumerî ne qewmekî semîtik e. Piraniya çavkaniyên pêsel-mîn, vê rastiyê destnîşan dîkin.

bû çêkirin. Paşê sembolan, xêzan cihê wêneyan girt. Di dawiyê de jî sistema kîteyî kete warê bikaranînê.

Perisîna zimanê sumerîyan di pêpelûka xwe ya paşîn de nekarî bigihîje serdema nivîsa elfabeyî.⁽⁶⁾ Ji ber ku ew li ser sistema nivîsa bizmîrî pêk hatiye û wisa hatiye nivîsandin.

Têkiliya Kur-kur û Kurkurdax

Ravekirina li jor wekî gava destpêkê ya ketina nava mijarê pêwist bû. Dema ez xwendevan bûm li Beşa Arkeolojiyê ya Fakülteya Zanîngeha Baxdayê, di xebata li ser hinek deq (tekst) an de, ez rastî hinek peyv û awayên gotinan dihatim ku di kurdî de bi guhartoyên bîçük dihatin bikaranîn.

Cemal Raşîd di lêkolîna xwe ya bi navê "Kurdish Study in the Country of Subarto" (Li welatê Subartoyan lêkolîneke li ser kurdî) de qala du peyvîn bi vî rengî dike: "Utu", "Kur-kur". Li gorî baweriya wî, peyva duyemîn têkil-darê peyva kurdî "Kurkurdax" e. Ev


peyva "kur"⁽⁷⁾ di wateya çiya de ye û geljimara wê jî "kur-kur" ango çiyan e.⁽⁸⁾ Dîsa ew bawer dike ku peyva kew jî ji "kur" a sumerî hatiye.

Bi dîtina min peyva "kêw" jî divê ji heman peyvî hatibe. Her çiqas Dr. Cemal Raşîd qala tu peyvîn din nekiribe jî, bi rûbêkirina hinek zimanîan bi kurdî re û ponijîna li ser binyada wan a resen wî bal kişandiye ser hîpek peyvîn din ên sumerî wekî; "gîstu" wîşt (hişyar), "Inna" xwedaya ciwanîy û "lu-lu" geljimara "lu" ku tê wateya wê piyaw (peyva) e.

Digel hinek şikîn min ên der barê van peyvîn kurdî û sumerî de ku hem-wate têni nimandin⁽¹⁰⁾, ez hinek peyvîn sumerî; digel wateya wan û sembolên ku ji ber tabletên resen hatine girtin pêşkêş bikim.

Ez lêkolîn û dahûrandina wan peyvan ji kesen pisporê mijarê re dihêlim, bi hêviya ku bibin sedema handana wan ji bo lêkolînê.

Peyv



+a- ev peyva sumerî tê wateya aw

(av) ê.

+gu- ev jî wateya gu (guh) dide.

Wekî goyî çem, goyî aw.

+tu- wateya vê peyvê hetaw e. Di tekstên sumerî de "dingir utu" tê wateya xiwawendî hetaw.

+sag- hemwateya "ser" a kurdî ye. Divê bê gotin ku ji aliye şeweyê ve ji ne dûrî vê peyvê ye.

+kelega- heman peyv di kurdî de di heman wateyê de tê bikaranîn. Tê wateya xurt û leheng.

+papilga- ev peyv jî gelekî nêzî peyva kurdî "bâpîr" e.

+numuzu- ev peyv di wateya "nazanîm" an ji "nazanî" de ye. Bi awayê resen "zu" zanîn e û awayê wê yî geljimar "zu-zu" ye û wateya "zorzan" ango mirovekî gihîştî dide.


+gudea- ev peyv hemwateyê "gotî" an ji "gutî" ya kurdî ye. Her wiha ev navê prensê navdar ê "Lekas" ê ye ji ku li Muzeaya Luverê jê re beşekî taybet hatiye tarxankirin.

+mu- ev cînavkek e û cihê "min" a kurdî digire.

+a-ne- di wateya "ew" a kurdî de ye.

+a-ne-ne- ew jî cînavk û cihê "ewan" a kurdî digire.

+me- cihê cînavkê kesane "ême",



"me" digire.

Perawêz:

1- Samuel Nosh Crimor, *The Sumerians: Their History, Civilization and Characteristics (Sumerî: Dîrok, Şaris-*

tanî u Rêwiştêwan), ji aliye Dr. Faysal Al-Wâilee ve hatiye wergerandin, Weşanxaneya Kuveytê.

2- Taha Bekir, *An Introduction to the Literature in Ancient Iraq (Destpê-keke Wêjeyê li Iraja Qedim)*, Baxda, 1975, r. 35.

3- Gelek lêkolîner, dîrokzan, arkeolog bawer dikin ku sumerî ji bakurê Iraqê hatine. Bo nimûne Fewzi Raşid di wê baweriye de ye ku sumerî bi eslê xwe nîstecihêne herêmêne. Her wiha ew qala Dr. Morgan dike ku sedema ji vê herêmê barkirina sumerian bi hinêk toreyênl olî yên tekildarî peristina bo diyardeyê siruşti ve girê dide. Binêrin li Dr. F. Raşid, *The Sumerian Question (Pirsâ Sumeriyan)*, rojnameya Al-Cumheriya, Baxda, 2 rezber 1984.

4- Heman berhem

5- Hevedudanî tê wateya hevedudanî du dengan ku bi pêkhatina peyveke nû encam dide. Wekî minak; hevedudanîna peyva "lu" tê wateya mîr û peyve "gal" ku tê wateya mezin, peyva "lugal" derdikeve ku wateya "key" di-

de. 6- Zimanê sumerî di dawiya jiye xwe de wekî zimanekî kîteyî ma, lê sistema pê nivîsinê guherî. Sumerî sistema alfabetik ji Ogarîte girt.

7- Navdér di zimanê sumerî de bi sê awayan dibe geljimar, yek ji van riyan

dubarekirina peyvê ye. Her wekî çawa ku peyva "kur-kur" wateya çiyan dide.

8- Wekî din, peyva "kur" tê wateya welatekî biyan û deriyê cihan jérîn ji.

9- Binêrin li Dr. Cemal Raşid, *Kurdish Study in the Country of Superto (1984, Baxda)*, Afaq Arabia Press, r. 12

10- Lî ew di lêkolîna xwe ya bi na-vê Kurdish Language Between Lingistics and History (Di Navbera Zimanî u Dîrokê de Zimanê Kurdi) de Cemal Raşid zimanê sumerî ji zimanê kevnare (antik) cuda dike. Binêrin li Dr. Cemal Raşid, Roşînbîrî Niwe, hejmar: 120-122.

11- Li wir qesta min hejmara yek e. Ji ber ku yê din wateyên cuda didin. Binêrin li F.A. Alî, A. Sulêman, *Introduction to The Study of Ancient Languages (Destpêka Lêkolîneke Zimanê Antik)*, Darul Kutub Press, Zankoya Musilê, 1980. Divê bê gotin ku deq ji vê pirtûkê ne.

12- Dr. F. Raşid, *The Grammar of the Sumerian Language (Rêzimanê Zimanê Sumerî)*, ev berhem ji aliye Wezîriya Agahdariyê ve hatiye weşandin (Baxda, 1972). r. 44

13- Heman berhem r. 44

14- Heman berhem r. 47

15- Heman berhem r. 47

16- Heman berhem r. 47

Wergera bo îngilizî: ALÎ OSMAN YAQUB
Wergera li kurmancî: SAMÎ BERBANG

Kursî û binbarî

MEDENÎ FERHO



Bêguman kursî yekemîn car, ji bo hewceyi û rûniştina mirovan hate çekirin. Dîzayna kursiyê pêşî çawa bû, kîjan xeratî qedûmê (tevşo) xwe bi wê armancê li dar xist, şahîk kir, kin û dirêj kir, xwar û girover kir, li hev û din siwar kir, hingî bizmar hebûn nebûn, bi benikan, yan bi dûwêlan (tayêni ji çerm) bi hev û din ve girêda, nizanim. Lê, tişte ku dizanim, wî xweş ciwamîrî hoste, mîjî û destêni xwe bi hev û din re xilmît kirin û ev halet û alavê pir balkêş ku evîndarî û maşoqiyeke pir mezin tê de heye bîfermoyî mirovaniyê kir. Bi qasî Edîson, mirovanî di nava ronahiyê de hişt..

Bi vê pêwanê gorbihiştî ye, di karê lihevsiwarkirina kursiyê de, xerabî, qencî, ew xap û rîpêni di nava hev û din de pêçayî, zirav û tenik hafî ristinî, di nava tevna dilmaniyê de hatiye pêçan. Helbet wê demê dîzayn tune bû!... Qalib û çarçoveya kursiyê jî di navâ ava kîmyewî ya mîjî de hate kişkirin, cih girt û hûrik hûrik hate serrastkirin. Her roja ku borî, li gorî demê, guhertin û nûjeniyê kursî jî xwe guhert...

Hêdî hêdî ji bin kelefî mirovan derket, li ser serê mirovan rûnişt. Hestiyên wî mirovê

ku cara yekemîn kursî çekir, pişti kursiyê, cih guhert, ji bin mirovan derket, li ser serê mirovan rûnişt, di nava axa sar de kete nava qolinca çirîzokî!.. Ew gora bihiştî, bû warê lerizandina ta û ba...

Pişti van gotinê girover ku bi kîjan alî de bêne kişandin maneyâ xwe dide û bi armanca pîrhîlî hatine nivîsandin, em hinek gazinê rastiya rojane bikin. Lê ne gazinê hêvidarî, gazinê gîsinî ku di çavên hinek kesan de biçikizin!...

Di dawiya sedsa la bîstan de ku pişti çar salan dikeve sedsa la bîstûyekê, mirovanî di nava jiyanekî lal û ebkemî de digevize!... Ne hawarîyê demokrasî deng û qîren bêbexî, derfehatî û zordariyê dikin, ne ew mirovân ku bi nobedariya cîhanê xwe berpîrsî pişti pêxemberan dibînîn, awaz û dilojarêya komên xelkê di nava gevzekâmirinê de dikin.

Êrişa dewleta Belçikayê ya li ser MED TV'ye ku bêhn û bixara kofî bi ser cîhanê xist û berjewendiyê tê dirave ku di neynîka rojê de ayan û beyan xuya kir... Mirovân ji hinek ezayên laşê xwe nexweş, ku ev nexweşî bûye tîk û li rûdêna wan bûye daxa şermazariyê, ketin nava lept û livandinê!... Bi rastî, polîsîn dewleta Belçikayê hinek ji me kurdan talan kirin!...

Êrişek ku di tu destûr û zagonê cih û waran de tune ye, hate lidarxistin. Ne bes cihê karê me oxilme kirin!... Em li mal ne li mal ketin hundir û wekî kî mala bavê wan e, bi tenê, her tişt tevî hev kirine û tiştek û miştekîn şexsî jî birine... heyâ bi pirtûkê

destnîs jî di nava wan del!... Çend parce zêrên kevnik û di nava xwêdan û gemara salan de reşbûyî jî!... û!... û, ji bo xerakirina pêkanîna karê xas, mîna porgramen komputer jî di nava wan tiştan de!...

Di destpêka sedsa la bîstûyekê de, nivîskar û rojnamevanen kurd bi kompterên herî paşketî, kevn ku (e) lê naxe, mîjî tê de tune ye kar dikin... Çavên wan canlidarêni di nava postikên dulingî, dudesî, duçavî de bi vê jî bar nebû... Dubare dikim ku bi yekî ji van pêkhatinan, li qasî ketina lept û livandina kesen ji me, lê desten wan di pêşira me de neêsiyam!... Min di temenê xwe yê têrgerçeşûn de pir kesen ku kursî ji bin xwe derxistine, danîne ser koklik xwe ku ne bes mîjî wan, serê wan jî di bin de winda bûye, dîtin. Mala Xwedê sed carî ava, heyâ tîro ji bilî kursiyê ked û bez û xwêdana min neketiye bin kelefîn min... Ev yek!... Têgihîştin û bîr û baweriya min ev e ku, kesen kursî danîne ser koklik û serê xwe di pêşerojan de her û her li rojîn borî poşman bûne... Ev du!...

Ya sêyemîn, li ser damezirandina Yekîtiya Nivîskarêne Kurdistanê (YNK) ye!... Saziyeke bi nîrx û pîroz e, hêvî û daxwazên gelê kurd pir in; ev sazî pêwist e ku bersiva van her du xalêne bingehîn bide!... Û!... Û her mirovân pêñûs di berika wî de heyî jî, nebe endamê wê!... Ji ber ku pêñûsa mirovân atar jî heyel!...

Ya çaran!... ku ji teva girîngir e, wekî ku birêz Apo di mesaja xwe de ayan kirî: "Kes nikare ji mesûliyetê birevel..."

Makyavelîzma humanîst

Bi ihtiâmaleke mezin, ewrûpiyan, ji dema J. J. Rousseau û heta iro jî dizanin ku kirasekî çirisî yê xapînok ji ronesansê hatiye kîrin. Dîsa jî, ji ber ku wan her tim bi xêra wî kirasi serdestiya xwe berdewam kiriye, dengê xwe dernexistine û hê jî tev bi hev re ji bo qralê tazî dibêjîn: "Çi kirasekî xweşik lê ye."

MAZHAR GÜNBAT

Her humanîst, her tim, ji her tiştî berpîrs e"** Humanîst: "Hiii!.. I don't care!"**. Ji bo me ronesans pêwist e an na? Bersiva pirseke wisa bêguman wê "erê" be û dibe ku di pey re jî ev rexne were: Pirsa bersiva wê diyar, neyê pîrsin çêtir e. Pirseke din: Kijan ronesans? Bersiveke din a diyar û bipirs: Ma ji derî ya rojavahî ronesanekî din heye? Pirseke din: Li Ewrûpayê ronesans pêk hatiye an na? Dibe ku hûn nema hêrsa xwe rabigirin û bibêjîn: De here ji xwe re hinekî dîroka rojavayê bixwîne û nema van pîrsan bîke!

Baş e. Ez dev ji pîrsen bersivdiyar berdidim, lê niha werin darî...

Pêşî çend agahî:

Park Mail, zêde ne bi nav û deng e, lê dîsa jî agahî û nûçeyên enteresan diweşîne. Ev kovara ku li Belçikayê derdikeve, di hejmara dawî de nîvîseke gelek balkêş, bi sernavê 'Derew aîdê mirovan e' weşandiye û tê de li ser derewîn sosret ên dîroka ewrûpiyan a çend sedsalên dawîn hatiye rawestin.

Nivîskarê lêkoliner Jankê Lévitche jî di pirtûka xwe ya bi navê xwe 'Derew' de, dibêje, derewê bêzerar hene, yên mina pêkenok û çîrokan. Feqet derewên mezin û metelhişti yên siyasi û dîrokî, dîkin ku mirov ji her tiştî bikeve gumanê (şikê).

Berî çend salan Prof. Yalçın Küçük jî idia dikir ku Zafera Înönü ya Yeke-minî dereweke mezin a Atatürk e. Niha idia Küçük ji xwe re gelek alîgiran dibîne.

Evet lêkoliner çawa gihane wê encamê ku ev bûyerên dîrokî neqewimîne an jî hatine berevajîkirin? Li gorî idiyêwan; pêwendîya eger (sebeb) û encamê di derewan de hev û din nagirin.

Di demen dawî de, li Ewrûpayê bi taybetî der barê ronesansê de, gelek tişt têne weşandin. Berhemên aidî humanîstên ronesansê di gel pêşgotin û pessinnameyên dûv û dirêj têne çapkîrin. Mirov dibêje qey kampanyayeke nû dest pê kiriye di vî warî de. Gelo ev ewrûpî çîma ew çend behsa ronesansê dîkin û xwe pê dipesinînin, tevî ku tiştîn ew dîkin û idiyêwan ronesansê ew çend ji hev dûr in? Nebe ku ronesans di bingeha xwe de bi tenê peykerekî riziyayî be ku ji aliyê ewrûpiyê doh û iro ve kirasekî tengîn ê xapînok lê hatibe kîrin? An ji...

Li gorî nîrîneke rexnegir, ji bo dîroka Rojava ya heta destpêka ronesans ku jê re dibêjîn 'Dema Navîn' an jî 'De-

ma Tarî' di serê mirov de pîrsen mezin çenabin. Ji ber ku qanûn, prensib, bûyer û encamên vê pêvajoyê ne di nav nako-kîyê de ne.

Ewrêne şikê li ser ezmanê sedsalên ronesansê li hev kom dîbin. Heta iro wi-sa hatiye nivîsandin û her wisa tê zanîn ku ronesans bi tarîfeke gîlover 'Çaxê Ronahiyê' ye. Her wiha bawerî pê hatiye ku di vê pêvajoyê de, di hemû waran de tiştîn qenc kulîlk vedane û her çûye hest û ramanê baş û humanîst li cem mirovên rojavahî xurt bûne; wekhevî, biratî, aştî, azadî, meraqa zanistî, nîrîna rexnegir, hezkirina ji bo mirov, civak û xwezahî êdî hem di dil, hem ji di jiyanâ piraniya rojavahîyan de cihê xwe bi kûrahî girtiye...

Ev gotinên xweş xemilandî bi serê mirov nakevin. Eger em iro zanist û teknolojiyê deynin aliyeke, li ber destê me ji taybetiyê ronesansê pir tişt namîn. Ji bin wî kirasekî tengîn û xweşfîroş ê ronesansê, peykerekî reş, pûc ku bi hest û nîrînen dijmirovî, xwedbin, berjewendperest... hatiye dagirtin, dertê ber çavan.

Fîlozofen ronesansê û şopajoyen wan; an xwe û pê re jî em xapandine; an jî ronesans ne wekî ku ji me re hatiye ikramkirin, rûdaye û bi gewde bûye; ji ber ku ji çaxê navîn heta dema 'mî', di dîroka Ewrûpayê de tu bûyer û pîrsîgirê-kên ku mirov karibe bîbêje li gorî prensib û rengîn humanîst gihane encamekê û çareser bûne, tune ne an jî iştîsna ne.

Helbet di hemû waran de, pêşveçün berdewam bûye. Lî belê ji ber eger û qanûnen xwezahî, ji ber debarnekirin û serhildanên civakî û şexsî yên li hemberî her cure zîlm û zorê ji ber neçariyê.


Di vê pêvajoyê de tu dewletên ewrûpî ji bo pîvan û prensibên ronesansa humanîst dev ji koloniyê xwe bermedaye; eger mecbûr nemabin, zikê birçî yên li ber mirinê jî têr nekirine. Gelên parzemînên din jî, ji pêşveçünên ewrûpiyan, wê nikaribûna kulîlkekê bêhîn bikin, eger li hêvî û benda xoşevîstiya ronesansê bîmana.

Pêwist nake ji xwe em behsa afatênu ku Ewrûpaya humanîst bi azîneyên ci-hêreng bi serê gelên din re anîne û tîne, bikin. Di her warê sîstema jiyanâ ewrûpî ya rojane de, hêmanên dij-mirovî û nexoşevîstiya ku serî ji dijberen xwe standiye, bi serê xwe bes in ji bo ku bi-hêle mirov ji çêbûn û hebûna ronesansê bikeve gumanê.

Esas ên ku serkêsiya ronesansê dîkin, wan bi xwe jî ji gotinên xwe yên xweşik û çakbîn bawer nedikirin. J. J. Rousseau ber bi dawîya temenê xwe ve fêm kir ku fîkrîn wî û yên hevalîn wî bi



Montesquieu



J. J. Rousseau



Voltaire



Montaigne

piranî xeyalî ne. Ji ber wê yekê, Rousseau kete nav buhraneke xemgîn, ji ci-vakê xeyîdi, di nav tenetiye de, bi dilekî şikestî serê we xweş.

Ya rastî, bi ihtiâmaleke mezin, ewrûpiyan, ji dema J. J. Rousseau û heta iro jî dizanin ku kirasekî çirisî yê xapînok ji ronesansê hatiye kîrin. Dîsa jî, ji ber ku wan her tim bi xêra wî kirasi serdestiya xwe berdewam kiriye, dengê xwe dernexistine û hê jî tev bi hev re ji bo qralê tazî dibêjîn: "Çi kirasekî xweşik lê ye". Her wiha ew, eyîn gotinan bi me ji didine dubarekîn; belkî ji tu kesî bi qasî me rojhilatiyan, bi dilpakî û safî ji humanîzmaya ronesansê bawer nekiriye.

Diyalogeke di navbera Makyavel û Montesquieu de gelek baş dide xuyakirin ku, yê pêşî hê di destpêka sedsalâ 16'an de ji her kesî bêhtir naveroka ronesansê fêm kiriye û şirove kiriye. Wî berevajîyê humanîstan, ne tiştîn ku di-vê bibin, lê yên dîbin û muhîtemel e bibin gotine. Ji vê hevpeyvîna di navbera her du filozofan de ku di pirtûka Maurice Joly de hatiye weşandin (Li dojehê hevpeyvîna rû bi rû ya Makyavel û Montesquieu) çend rêzên balkêş:

Montesquieu: "Hûn hîç behsa xwe nakin, Makyavel, ev ci mutevazîtiyeke gewre ye ji bo yekî ku bi berhema 'Mî' ew çend navûdeng daye!"

Makyavel: "Ez pê dertînim ku hûn bi zimanekî sergirtî kenê xwe bi min dîkin. Erê pirtûka bi nav û dengê min deranî. Wê ez kirim bin barê gunehkariya hemû dîktatorîyan... Wê hêrsa gelên di bin lingê despotan de diperçiqin, heri-kande ser min, tevî ku mîna hemû kesen ku di warê xwe de xebat dikirin, min ji

di warê siyasi de xizmeta welatê xwe kir."

(Pişî vê axaftina Makyavel, ewê din rexneyeke dûr û dirêj lê dike û pesnê humanîstiyê dide).

Dîsa Makyavel: "Niha li min bimey-zînîn birêz Montesquieu! Hûn xelet in. We tu tişt ji min fêm nekiriye. Sûcê min ew e ku min rastî ji mirovan re gotiye. Min rastiyêni siyasi anîne ziman; ne yên ehlaqî. Min behsa rastiyê heyî kirine; ne yên divê hebin.

Avakarê doktrîna ku li min tê barkirin ne ez im. Makyavelîzm beriya Makyavel jî hebû. Ev doktrîn dî xwezahiya hemû mirovan de heye. Hûn ên humanîst giş di nav xewn û xeyalan de dijîn; hemû hewldana we ew e ku, hûn rastîyên mirovî, civakî û qanûnen xwezahî, li gorî xeyalîn xwe berevajî bikin û dirûvekî din bidin wan...

Cudahiya min û we ev e: We tiştîn di xeyala xwe de gotine û nivîsandine û mirov bi xeberên xweş xapandine. Heçî min, rastî û prensibên heyî û serdest anîne bîra mirovan."

Wisa xuya ye ku iro Ewrûpa van her du doktrînan jî li gorî berjewendiyê xwe, bi kar tîne; ew bi zimanê humanîstan dipeyive, lê bi xeberên Makyavel dike. Di encamê de doktrîneke sentez; humanîzma makyavelîst an jî Makyavelîzma humanîst.

Niha ez dîsa dixwazim bipirsim! Ji bo me ronesans pêwist e an na? Kijan ronesans?

Li Ewrûpayê ronesans pêk hatiye an na?

* Gotineke Montaigne

** Ji min re çi! (Îşê min pê neketiyel)



● 04.11.1964

Dijberê rejîma Şah Pehlewyê û Iranê, Ayetullah Xumeynî nefî bû. Nêzî sê salan li Bursayê ma, piştre çû Iraqê bajarê Necefê. Dûre jî ji wir derbasî Parîsê bû.

● 07.11.1917

(Li gorî salnameya rûsî 24'ê kewçêrê) Şoreşa Octobra Mezin li Rûsyayê bi ser ket. Şoreş di bin serokatiya îlifaqa Partiya Karkeren Sosyal Demokrat a Rûs (PKSDR), Partiya Şoreşgerên Sosyalist ên Çep (PSSPC) û hin muxalifên din de meşîya. Navenda Qerargeha serokatiyê Enstituya Semolskayê (Dibistana Keçan) bû. Serokatiya konseya şoreşê

di destê Vladimir İlyîç Ulyanov Lenîn de bû.

● 07.11.1918

(7 Teşrin-î Sanî 1334) de li Stenbolê kovareke kurdî dest bi weşanê kir. Zimanê kovarê kurdî û tirkî bûye. Ü tê gotin ku ev weşan weki organa Komeleya Pêşketina Kurdistanê (Cemiyeta Tealf ya Kurdistan) bû. Kovar 25 hejmar derketiye, heyâ hejmara 22'an 16 rûpel, hejmarên 15, 16'an jî 25 rûpel derketine. Di nava kadroya kovarê de kurdên Kerkük, Silêmanî, Amed û ji Bîlîsê cih girtine. Di nav nivîskarên kovarê de Tewfîqê Silêmanî, Xelîl Xiyâlî, Kemal Fewzî, Memdûh Selîm, Ezîz Yamulkî (nivîsên wî bi tirkî bûn) sû hwd. hebûn.

AWIR

Pirsa rewşenbîriyê

Ev şano li ser helwest û psîkolojiya “rewşenbîr”ekî radiweste. Ew kes piştî ku tê girtin dibe koleyê tîrsa xwe. Li aliyekî newêre tiştekî bike, li aliyê din naxwaze navê rewşenbîriyê jî ji ser wî rabe. Lewre jî dixwaze bi dek û dolaban rewşenbîriya xwe bidomîne.



Rewşenbîr kî ye? Ji kî re rewşenbîr tê gotin? Gelo her kesê ku xwediyê hinek pêzanînan e, rewşenbîr e? Pirsên bi vî rengi niha di nav rûpelên kovar û rojnamayan kurdî de têne nîqaşkirin.

Ne tenê li nav rûpelên weşanên kurdî, êdî ev nîqaş ketiye rojeva şanogerên kurd jî. Şanogerên kurd her weki beşek ji rewşenbîran bi berhemên xwe besdari vê gengeşiyê dibin. Şanoya Hêvî ya ku xebatêna xwe li NÇM'ya Îzmîrê di domîne, van rojan listikeke bi navê “Sîmûrg û Ronahî” pêşkêşî temashevân Stenbolê dike. Ev şano li ser helwest û psîkolojiya “rewşenbîr”ekî radiweste. Ew kes piştî ku tê girtin û hemû tişteku ku dizane ji polîsan re dibêje, ew dibe koleyê tîrsa xwe. Lewre jî ew dikeve keft û lefta çûna Ewrûpayê. Li aliyekî newêre tiştekî bike, li aliyê din naxwaze navê rewşenbîriyê jî ji ser wî rabe. Lewre jî dixwaze bi dek û dolaban rewşenbîriya xwe bidomîne.

Lê, li qada jiyanê ew bi tenê nîn e, li derdora wî mirov hene, jê xebatê dixwazin; di serî de jina wî û xorhekî xwendevan. Her wisa li dora wî giyanen şehîdan digerin. Hejmara wan her roj zêdetir dibe û têkilî wî dibin, jê hebab dipirsin.

Şano di warê ragihandina peyama xwe de serkeftî ye û baş hatiye honandin. Lîstika Kosegelî û dansa gerîla


rengekî xweş daye şanoyê. Lî hinek lîstikvan di pêkanîna rola xwe de ewqas ne serkeftî ne, bi taybetî “rewşenbîr” divê karesata ku kesê rewşenbîr tê de ye hinekî din baş hîs bike, nakokîya di nava kesê rewşenbîr de hinekî baş bide xuyakirin.

Li aliyê din, di şanoyê de ji bo dermankirina vê birîna xedar, tiştek nayê gotin. Rast e wê gel rewşenbîrên xwe derxe hólê, her weki tê gotin, “ronahî malê kesen ku ji bo vê ked didin e, ne malê kesen ku lê dibin xwedî ye”, lê mirovîn me yên ku bi vê nexweşîya derûnî ketine wê çawa bi ser xwe ve bén. Li ser vê yekê tiştek di şanoyê de tune, bi tenê darizandina kesê “rewşenbîr” heye. Divê çend tiş jî li ser zimanê şanoyê de bén gotin, di şanoyê hinek lîstikvanan bi zimanekî jîberkîrî, çêkîrî xeber didin, hinek, peyvîn ku ne hewce bin, têbikaranîn. Wek mînak peyva azîne tevî metod, lê ne li cihê xwe tê bikaranîn. Dîsa li gorî baweriya min di şanoyê de zimanekî gelêrî hebe çêtir e. Li aliyê din di şanoyê de kesê ku bi zimanê gelêrî xeber didin hene. Bi devokekî derî rîzimîn xeber didin, bo nimûne, hevalê ku çîroka Kosegelî vedibêje, bi kurdiyeke gelêrî û rawan diaxive, lê mixabin di axafîtinê wî de jî gelek çewtiyên rîzimanî hene.

S. MIRDÊSÎ

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Xwefiroş û kulturfiroş

Mirov dema li kanalên televîzyonên tirk temâse dike, kurdan û kultura kurdan dibîne. Wêne û müzik bi kurdî ne, lê azaftin bi tirkî ne. Kurdên xwefirôş kultura kurdî difiroşin. Hîn dema ku radyo û televîzyon tune bû, her cureyên kultura kurdî bi nivîskî dikirin tirkî. Bi taybetî stran, çîrok û xebroşkîn kurdi hatin berhevkirin. Gotinê stran guhartîn, hê jî diguherin û ji wan re gotinê tirkî dibînin. Çîrok û xebroşkan jî werdigerin tirkî. Piştre ku radyo, kaset û sêlikên stran derketin, êdî deng jî guhartîn û kirin tirkî. Niha dem dema televîzyonê ye, vê carê bi deng û wêne kultura kurdî talan dîkin û wekî kultura xwe pêşkêş dîkin:

Her êvar mirov kîjan kanalî veke, rastî stran, pêkenîn an jî govend û adetên kurdî tê. Di warrê asîmîlekinin û dîziya kultura kurdî de seferberiyek mezin û dijwar heye. Di kanalekê de İbarahim Tatlıses, di ya din de, İzzet, Altınmeşe, di ya din de Burhan Çaçan, Mahsun Kırmızıgil, Küçük Emrah, Nuri Sesigüzel.... nizanîm kî û kî û kî Yanê bi navê “Türk halk müziği” çîqas stran hene, %90 ên kurdî ne û gotinê wan guhartine, kirine bi tirkî.

Ji aliyê din ve her şev ji bajar, an jî ji herêmeke Kurdistanê govend û dîlanên kurdî hene. Ji Amedê, Ruhayê, Dîlokê, Çêwlikê, Flezîzê, Wanê, Culemergê.... miheqeq ji herêmeke Kurdistanê komeke folklorê heye. Di van salêna dawîn de hinek kanalên tirk li ser navê dawet û adetên xwe yên gelêrî hemû ji yên kurdan girtine û orjînalê kurdî bi zanabûn xera kirine û dîkin.

Dîsa mijara skeç, şano û programên pêkenîn yan kurd in yan jî laz in. Qehremanen bûyeran an kurd in an jî laz in. Cihê bûyeran an Kurdistan e, an jî ew kurdên koçber in ku hatin metropolên Tirkîyê. Yanê mîzah jî an a kurdan e an jî babet kurd in. Her wiha rewşa xwarina wan jî ne cihê ye. Heger jî xwarînên ewrû payîyan nebin, ên din hema hema %80 yên kurd, erreb, fâris û emeniyan in.

Yanê mirov dikare bîbêje ku bi kevirekî du çûkan dikujin: Ji aliyekî ve kultura kurdî ji xwe re didizin û dîkin tirkî û ji aliyê din ve jî, temâsevan jî dîsa kurd in. Ne bi zimanê wan bi zimanê tirkî stran û folklorâ kurdî bi kurdan didin guhdar û temâsekirin. Bi stran û meqamên kurdî bi mîlyonan kurd dixapînîn û mîjîyê wan av didin. Her wiha ew kurdên ku bi çend salan bi zimanê tirkî guhdariya müzik û stranên kurdî bikin, pişti demekê êdî ew bi xwe bawer nakin ku ev stran an jî meqam bi kurdî bûne.

Ev kurdên ku di-warê kulturê de stran, meqam û govendên kurdî bi dizî an jî bi awayekî eşkere didizin an jî bi darê zorê dibin û ji tîrkan re dîkin mal, bi qasî wan caşen ku li dijî şoreşa gelê kurd a neteweyî çek hildane, tawanbar in. Weki kewê dijminê gelê xwe ne. Mirov dikare bîbêje ku ev kes û derderôn wiha jî caşen kulturî ne. Ji bo pere û bi kariyera xwe kultura gelê kurd a hezar salan didizin û difiroşin. Bi awayekî zanabûn zerara herî mezin didin kultura kurdî û bi vê yekê re didin kultura cihanê jî. Dewlet ji aliyekî ve ziman, edebiyat û kultura kurdî qedexe dike û ji aliyen dn ve jî rî. Û îmkânî dide van kesen wiha, ku edebiyat û kultura kurdî bidizin û wekî ya tirkî bidin nişan. Kesen wiha yên xwe û kulturfiroş di demeke nêzîk de gelek navdar û dewlemend dibin. Ew ji tirkekî bêhtir dibin tirk. Kurdayetiya xwe înkâr dîkin.

Em kurd divê tu carî van caşen kulturfiroş jî bîr nekin. Li hemberî wan her cureyê tékoşînê bi kar bînîn. Di her fersendî de û li her cihî rû û rûcikên wan bi awayekî vekirî eşkere bikin. Ew xelîl maskeya ku li ser çavêwan hene biçirîn û bavêjin. Di her fersendî de bi bîra wan bînîn ku gelê kurd van xwefiroş û baziraganên kulturî efû nake û dê neke jî. Karênu ku dîkin jî caşîtiya çekdarî ne kêmter e. Xwefiroş, xwefiroş ye. Ferqen wiha mezin di nav ên çekdar, ên neçekdar û yên kulturfiroş de tune ne.

Derhênerê filma "Işıklar Sönmesin" Reis Çelik:

Hunera tîrkan ji vî şerî re mabû temâşevan...

Di rojêñ dawî yên meha kewçêre de filma "Işıklar Sönmesin" ke-te vîzyonê. Di reklamên rojnameyan de, beriya ku film bê nîşandan, îbareyeke wiha (bi tirkî) li ser afîşa wê hatibû nîvîsandin: "Jan û êşa ku li başûrê rojhilatê welatê me tê kişandin, yekemîn car e ku eksî perdeya sînemayê dibe." Ev gotin, bi ıdia bûn. Hevalê me RAHMÎ BATUR xwe gihande derhênerê film Reis Çelik û der barê filmê de pîrsen xwe arasteyî wî kirin.



Havînê dema min di rojnameyekê de nûçeya li ser çekirina filma "Işıklar Sönmesin" (Bila Ronî Netemirin) xwend, tenê ev hate hisê min: Çapemeniya tîrkan bi ci çavî li pîrsîrêka kurdan dinêre û bi ci çavî li gerîlîyan dinêre; wê nêzîkahiya vê filmê jî ev be...

Yanê tu pîrsîrêk li holê tune, tenê komek "terorist" peyda bûne, li serê millet û dewletê bûne "bela" û leşkeran ji dane dû wan ku milet û dewletê ji wan "rizgar" bikin.

Lê tenê navê Tunçel Kurtiz tevlihevî derdixist. Min bawer nedikir ku wê ew di filmeke gelek xerab de bilize.

Cîma?

Lewra pêwistiya wî bi nav û deng û şan û şohretê tune, jîxwe ew hunermen-dekî bi nav û deng e... Û insaneñî çepgir e, aştîxwaz e. Navê wî bû sebebê şik û gumanan û hew...

Berî niha bi çendeyekê galaya filmê hebû. Bi rastî film li gorî şertên iro û te-vî hemû kêmasyen xwe, bi niyeteke baş û bi awayekî aştîxwazî hatîye çekirin. Di warê hunerî de, ji kostûman bigirin hetanî hilbijartina stranan, li gorî min gelek kêmasi hene. Lê dubare dikim:

Li gorî şertên iro, êdî ev e û çebûye... Jîxwe dema film xelas bû, em ji salonê derketin û me lîstikvan Berhan Şimşek û Derhêner Reis Çelik pîroz kir, beriya ku em biaxivin, Berhan Şimşek "Hinekî nerm çebû, lê dî şertên vê deme de, ji vî çêtîr çênedibû" got: Yanê ew bi xwe jî ji kêmasyen xwe haydar in... Mebest ci bû, astengî ci bûn û kêmasi ci ne? Reis Çelik bersiva pîrsan da:

Hün di serî de dikarin kurteçiroka filmê ji me re diyar bikin; çawa çebû ku we filmeke bi vî rengî, bi vê naverokê çêkir?

O Di destpêka ramana vê filmê de tu roleke min tune ye. Nêzîkî sê sal berê, Produkтор Ferdi Egilmez vê fikrê eşkere dike û Cemal Şan senaryoyê dînîvîsinê. Ji Berhan Şimşek re dibêjin tê de bileyîze. Berhan Şimşek ji mijarê gelekî hez dike; diçine ba gelek rejîsorêna navdar, lê kes newêre xwe bide berê...

We çawa qebûl kir?

O Berhan Şimşek hate ba min, got "Cih nemaye me serî lê neda, lê kesî qebûl nekir, ger tu jî qebûl neki, emê vê defterê bigirin..." Senaryo xweş bû, lê bi tevahî ne li gorî fikrên min bû. Yuzbaşî û gerîla dibine destebira, dibine bîra... Bi hev re masiyan digirin, derdikevine nêçîra kêvroskan!

Min got, ez vê senaryoyê bi vî awayî nakişinim. Yanê, ji aliyeke ve ser bi hemû şîdetâ xwe didome, lê ev her du mîrov dibine bîra, bi hev re masiyan digirin, derdikevine nêçîra kêvroskan!.. Min xwest ku senaryoyê ji nû ve binivîsinim û aliyeñî siyasi jî tevlî bikim, gotin, qebûl. Cemal Şan careke din nîvîsand, lê min dîsa neeciband.

Min bi xwe nîvîsand û em (Berhan Şimşek, Ferdi Egilmez, Cemal Şan û ez) tev rûniştin, me ji nû ve sererast kir.

Ev ne çêkirina filmeke ji rezê bû, mi-jareke taybet bû; dema we dest bi kişidina filmê kir, astengî derketin?

O Ji lîstikvanan hetanî kameraman, tîrsa me tevan yek bû; ci bû ev tîrs? Me bûyera Başûrê Rojhilat (Güneydoğu) di-kişand; yan em şaş bêne fîmkirin, yan hînek kes êrişî me bikin, yan ev film ji vî aliyeñî re û ya jî, ji aliyeñî din re xizmetê bike... Tîrsen me ev bûn.

Li vî welati şerek, êş û janek hebû, lê sînemaya tîrkan, ji vî bûyere re mabû temâşevan; hunera tîrkan, parlementoya tîrkan ji, ji vî bûyere re mabû temâşevan... Ü ew mîrovênu ku êş û jana vî şerî dîkişinî ji, nikarin dengê xwe bilind bikin, dengê wan hatîye fetisandin. Diviya mîrov ci bikira?

Ger huner ji civakê qut be, ji demê dûr bikeve û rewşa dema xwe diyar neke, ew ne huner e... Min xwest ku ez neynîkî li dema xwe, li welatê xwe bigirim.

Di vê mijarê de nîrîna we û yên lîstikvanan, yê produkтор, yê tevan yek bû; di navbera we de nakokî derketin?

O Na, cudabûnên me yên fikrî hebûn. Produkтор li gorî xwe, li gorî rewşa

xwe dixwest bi derekê ve bikişîne... fikrîn cuda hebûn û van cudabûnên fikran, rewşa xwe dane filmê. Nîqaşen di navbera me de, heta dawiyê dom kir...

We ji bo alikariyê ji "Genelkurmay"ê daxwaz kiribû; li ser vê daxwaza we, ci bersiv dane we?

O Min di destpêka filmê de dixwest ku ew çavkaniyên lazim e di xizmeta gel de bin, bi ci awayî û vî şerî de berhewa dibin, li ber çavan eşkere bikim. Ji bo vê jî çekîn mîna top, tank û helikopter lazim bûn. Ev çek li ba kî peyda dibin? Li ba leşker û polîsan. Me ji leşkeran daxwaz kir, lê gotin ku, "Ku em senaryoyê bipejirinîn, emê alîkariyê bikin."

Senaryo çawa nirxandin?

O Ez bi xwe neçübûm, lê ji produkтор me re gotibûn: "Hûn nikarin subayekî tîrkan bikin emsalê terorîsteke PKK'ê û sûbayekî tîrkan ji kurdekkî re serê xwe natewîne, jê re ifade nade. Ku hûn di vê daxwaza xwe de israr bikin, wê rî li pêsiya we bêne girtin..."



Yanê nexwestibûn ku gerîla bi awa-yekî bas bê nişandan.

Ji bo ku di senaryoyê de guherîn cê-bin daxwaz kiribûn, ku kiribin, daxwa-zên wan ci bûn?

O Li gorî xwesteka wan; gerîlayekî birîndar tê girtin, wî dibine qereqolê xwarin didinê, cilan didinê û hwd...

Piştî ku we ev film kişandiye, sâbayek hatiye ba we; ji we re ci got, ji we ci xwest?

O Piştî ku di çapemeniyê de li ser fil-mê nûce derketin, sâbayek hate ba min. Li Silopiyê wezîfe dikir. Yekser "Ez dixwazim destê te ramûsim" got. Û pişt re li gotina xwe zêde kir:

"Ez 'teğmen' im. Ku bawer nekî, ji te re nasnameya min... Ez li vî welatî bira-yen xwe dikujim; di nava xwe de tim di-bêjim hawar û hey hawar!.. Ez narevim jî... Ezê wezîfeya xwe bikim, lê tim di-bêjim hawar! Kes tune ku vê kuştinê bi-de sekandin."

Yanê li vî welatî yên ku bi "hawar... hawar!" şer dikin jî hene, lê şerxwaz jî ne kêm in...

We gerîla dîtine heta niha an na?

O Ez texmîn dikim ku di nav rojnamevanan de, li ciyê cara yekem ez rastî endamîn PKK'ê hatime. Di sala 1982'an de, ez ji bo ku hevpeyvînekî bi koçeran re bikim, çûbûm Wanê, Zozanê Olemanê. Li wir ez rastî hinik mirovîn bi çek hatim. Min jî gundiyân pirs kir, gotin: "Ev jî artêşa me ye..." Nehîstîn ez wêneyê wan bikişinim.

Pişt re jî bi munasebeta rojnamevani-yê, gelek car min ew dîtine. Yanê ez ji-yana wan dizanim...



Kostüm xerab in; uniformayê gerîla-yen hene, lê we cilikên alelade li wan ki-rine. Dema we film kişand, sêwirmen-dên we hebûn?

O İro li herêmeke welat serhildan he-ye, şer heye; tiştî ku bala min dikişine ev e. Min xwest ku zarokên gel bidime nişan. Cil ne muhîm in. Yên leşkeran jî bi vî rengî ne. Ma uniformalayen koman-doyen ciyê wisa ne, çima ji bo yên wan

rexne nayen?

Belkî kêmasyiyek be, lê ev ji bo min, tiştîn biçûk in.

Uniformayê leşkeran jî, yê gerîlayan jî ku orjinal bûna wê ne bêhtir nêzîki rastiyê bûya? Yanê, yek ji bo jiyanâ leş-kerî û yek jî ji bo jiyanâ gerîla; ku du sê-wirmendên we yên pispor hebûna, wê ne çêtir bûya?

Ó Gelek zehmetî derdiketin. Ji ber zor û zehmetiyen xwe, ev senaryo sê ca-ran hatiye nivîsandin. Yanê mirov li ser devê kîrê dimeş... Tu santîmek bi vî aliyî ve werî dewlet, bi wî aliyî ve herî, PKK... Lî tu naxwazî ku filmê te bibe yê dewletê, an jî yê PKK'ê...

Daxwaza te piştgiriya aştiyê... Piştgi-riya gel e, yê ku ês û jana vî şerî hildigi-rin... Gund têne şewitandin, têne valaki-

Serkanê (Genelkurmay Başkanı) me dibêje, ev kar bi riya diyalogê çenabe. De ka ev panzdeh sal e te ci kir? Ew çend pere, ew çend can, ew çend xwîn... Em li ser welatê xwe alê dadiçikînin, dibêjin; me ev çiya zeft kir!

rin; tu aligirê wan mirovîn dilşewat i...

Li hemberî filma we reaksiyoneke ca-wa çebû?

O Ji sedî not, reaksiyoneke baş heye. Yen ku reaksiyoneke ne baş jî nişan di-din hene, lê kêm in.

We li ser mirina gerîlayekê strana evîniyê bi kar anîye, çima we ya li ser miriyan bi kar neanî?

O Ji ber ku gelê kurd gelek êş û jan dîtiye, di gelek stranê wan ên evîniyê de jî, xemgîniyeye mezîn, mîna ya mirînê heye.

Ü Xezal Xezal jî straneke wisa ye... Ji keynî vê stranê, sê stranê din hene ku berhevkarê yek ji wan stranan ez im. Min ew stran ji devê pîrekjineke şest û pênc salî girtiye.

Yanê aliyê min ê berhevاريye jî heye. Min ji Ruhi Su re jî stran berhev kirine...



Ew zehmetî û bêîmkânî ci bûn?

O Bawer bike ku, tu filmeke tirkan di nav şert û mercen ev çend zor û zehmet de nehatiye kişandin. Me li bilindahiya du-hezar metreyî û di nav du-sê metre berfê de xebat dikir. Em saet di çarê si-bê de radibûn di nav berfê de ber bi jor diçûn heta saet dibû deh, hêj em digihîs-tin cihê xebatê û me bi sed kiloyan eşya hildigirt, bi xwe re dibir. Ji ber serma û seqemê em gelek caran hatin radeya mi-rinê...

We mijareke taybet di rewşeyeke taybet de kişand; dema we senaryo nivîsand, vê rewşâ taybet li pêşîya wê tu astengî dernexistin?

Ji amûrêن fûkîrinê

Baleban, duzele û bilûr

Bilûr, amûrekî resen î kurdî ye û tê gotin ku, di destpêkê de, tenê ji bo lawij, heyranok, beyt û ji bo komkirina pez û dewarên xwe, ji aliye şivanên kurdan ve hatiye afirandin. Wisa hatiye zanîn ku heta niha, ji bîlî kurdan, tu miletên dîtir ên cîhanê, li vê amûrê xwedî derneketine.

Berî destpêkirina babeta xwe, min divê bidim xuyakirin ku, pişti nivîsa li ser mêtjuya amûrên muzîka kurdewarî û danasîna dahol û zirneya kurdewarî di hejmarê 34 û 35'an ên Azadiya Welat de, wisa diyar dibe ku ev babet bala xwendevanan kişandiye û çi rû bi rû û çi jî bi telefonê, berdewamkirina vî babetî ji me hatiye xwestin.

Li ser vê daxwazê, em xwendevanê Azadiya Welat agahdar dikin ku, li ser bingehêke lêgerin û lêkolinan ji layê mêtjuya ve, emê berdewam bin' li ser danasîna amûrên muzîka kurdewarî. Bêguman, wekî her car, dîsa wê çavkaniyêne me ji pirtûka "Amêrekanî Mûsîqay Kurdî" ya lêkolinerê hêja Ur-ya Ehmed be.


Baleban

Yek ji kevintirin amûrên fûkîrinê (pîskîrinê) yên muzîka kurdî jî baleban e. Wateya peyva 'baleban', (li dûv lêgerîna Mamosta Ûryâ):

Di Ferhenga Mehabad de (1961) wisa derbas dibe: "Baleban curekî teyran e û curek ji amûrên muzîkê ye."



Bileban



Duzele

Di Ferhenga Xal de (1960), dibêje: "Balindeyekî (teyrekî) goştxwer û nêçîrvan e û ji teyrê baz mezintir e. Her wisa amûrekî muzîkê ye."

Di Ferhenga Zimanê Kurdî, Zebîhî de (1979), wisa derbas dibe: "Baleban, balindeyekî nêçîrvan e. Ji baz biçûktir e, bask û neynûkên wî dirêj in û dengê wî bilind e. Di zimanê rûsi de jê re "baraban" tê gotin ku ev peyv, di wateya "tepla mezin" de ye."

Duristkirina vî amûrî

Ev amûrê muzîka kurdî ku ji sê besan durist dibe, dengekî bişewat, stûr û gebe li ser heye.

Beşê yekê jê re 'qamîş' tê gotin. Ev qamîş dikeve kuna (qula) serî yê darê balebanê û dirêjiya vî qamîşî 12 cm. ye û pehnbûna wî jî 2,5 cm. ye.

Beşê duyemîn yê vî amûrî, jê re 'darê baleban' tê gotin. Dirêjiya darê balebanê 31,5 cm.ye. Di darê balebanê de heft kun (qul) hene. Di navbera her kuneke de nêzîkî 1,5 cm. heye. Li hêla binî yê darê balebanê jî kuneke heye.

Her wisa parçeyekî dîtir jî heye ku



Baleban

li hinek cihan jê re 'çoleme' û li hinek cihan jî jê re 'dembest' tê gotin. Ev parce e ji, ji bo parastina hundirê amûr e.

Li gorî tevaya balebanjenan ev amûr, ji darêni mişmişan, enneban û giwîzan (gûzan) çedîbe. Ji ber ku ev darêni navbirî hişk in û demeke dirêj xwe radigirin. Her wisa ji hêla deng ve jî cuda ne ji darêni dîtir. Dengê ku ji van daran derdikeve, zelaltir û bişewatir in ji darêni dîtir.

Duzele

Amûrê duzeleyê jî wekî balebanê amûrekî fûkîrinê ye. Ev amûr, di nav kurdan de ji bîlî navê duzele, bi navên wekî; dunay, dûdik, cotzele û zembere ji tê nasîn.

Duzele, ji qamîş li nav avan durist dibe. Beşê serekî yê vî amûrî, ji du zîlén wek hev dirêj, wek hev stûr û bi hev ve zeliqandî pêk tê. Di her zilekê de şes kun hene û kunêñ her du zilan beramberî hev in.

Du qamîşen biçûk jî hene ku ew ji dikevin devê duzeleyê. Ji van qamîşan re, 'pîk' tê gotin û dikevin devê duzeleyen. Dirêjiya qamîşê vî amûrî 19,5 cm. ye. Dirêjiya qamîşê pîk jî 1,5 cm.ye.

Mêtjuya bilûrê

Ev amûr, amûrekî resen î kurdî ye û tê gotin ku, di destpêkê de, tenê ji bo lawij, heyranok, beyt û ji bo komkirina pez û dewarên xwe, ji aliye şivanên kurdan ve hatiye afirandin. Wisa hatiye zanîn ku heta niha, ji bîlî kurdan, tu miletên dîtir ên cîhanê, li vî amûrê xwedî derneketine.

Hêjayî gotinê ye ku, wekî navên dahol û zirneyê, wekî navê şîmşal û balebanê, navê bilûrê jî dî gelek çîrok, stran, lawij, heyranok, payizok û pêgotiyêñ kurdewarî de, bi berfirehî derbas dibe. Bi kurtayî bilûr jî mîna van amûrê navbirî, parçeyekî girîng e ji jiyanâ kurdewariyê.

DILDAR ŞEKO

amûrân in."

Hinek kevirênu ku ji hêla arkeologan ve li devera Qeretepeyê hatine derxistin, mêtjuya vî amûrî digihîn sedsala heftan berî zayînê. Ev kevir, niha li Muzexaneya Berlinê têne parastin.

Bilûr


Ev amûrê ku di nav kurdan de, wekî bilûr, bilûl, bilwîr jî tê bînvîrin, mîna baleban, duzele û zirneyê ew ji amûrekî fûkîrinê ye. Ev amûr, ji qamîşekî darîn û stûr durist dibe û ji heşt kûnan, (heft kun li jor in, kuneke jî li binî ye) pêk tê.

Amûrê bilûrê, tenê ji du parçeyan durist dibe. Parçeyê yekemîn ji darqa-mîseke girover ku dirêjiya wî 34,5 cm. ye û parçeyê duyemîn jî 2,2 cm. ye. Ev parçeyê dawîn, dikeve devê bilûrjen, yanê bilûrvan.

Mêtjuya bilûrê

Ev amûr, amûrekî resen î kurdî ye û tê gotin ku, di destpêkê de, tenê ji bo lawij, heyranok, beyt û ji bo komkirina pez û dewarên xwe, ji aliye şivanên kurdan ve hatiye afirandin. Wisa hatiye zanîn ku heta niha, ji bîlî kurdan, tu miletên dîtir ên cîhanê, li vî amûrê xwedî derneketine.

Hêjayî gotinê ye ku, wekî navên dahol û zirneyê, wekî navê şîmşal û balebanê, navê bilûrê jî dî gelek çîrok, stran, lawij, heyranok, payizok û pêgotiyêñ kurdewarî de, bi berfirehî derbas dibe. Bi kurtayî bilûr jî mîna van amûrê navbirî, parçeyekî girîng e ji jiyanâ kurdewariyê.



Li navendê çandê vê hefteyê:

Li NÇM'ya Stenbolâ

- 03.11.1996 Yekşem: Panel: Enstîluya Kurdî, "Kürt tarihinde metodolojik Sorunlar", saet: 13.00
- Konsera: Koma Gulen Xerzan, saet: 18.00
- 06.11.1996 Çarşem: Gotûbêj (Söylesi): Şoreşa Octobrê, Zeki Öcal, saet: 18.30
- 08.11.1996 În : Panel: Bîranîna Melayê Cizîr, saet: 13.00
- Film: Bisiklet Hırsızları (Dizén duçerxeyê), saet: 18.30
- 09.11.1996 Şemî: Konsera Koma Çiya saet: 13.00

Belgefîlma NÇM'ê, saet: 15.00

Teatra Jiyana Nû: "Zevîya Diyanê", saet: 17.00

Li Evrensel Kültür Merkezi

- 01.11.1996 În : Film: "Brave Heart", saet: 15.00-19.00
- 02.11.1996 Şemî: Şanoya Koza: "Bir Şeftali Bin şeftali"
- 03.11.1996 Yekşem: Şanu, Metin Zakoğlu: "Bir Delinin Hatırı Defteri" saet: 17.30
- 06.11.1996 Çarşem: Film: Kırmızı Pazartesi (Duşema Sor)
- 07.11.1996 Pêncem

Film: Günaydın Babil (Rojbas Babil)

RÛDAN

Pêdiviya peyivîn, xwendin û nîvîsîna bi kurdî

Nûnerên partiyêne wekî Yekîti, Hevgirtina Gel û Demokratêne
Pêşverû, ji besdaran re ronî kirin ku hebûna partian
di civaka kurdî de şana şaristaniyê ye,
ji ber ku hêzêni siyasi yêndî kurdî ala mîletê kurd
û hebûna wî, di hemû waran de hildigirin.

Rewşenbîrêne kurdî hêdî hêdî hest
dibin ku zimanê kurdî ku di vi
welatî de dikeve bin astengiyan,
dibe sedema gelek tiştan. Ji ber vê ye
kê "Koma Xanî ya Çanda Kurdî" hinek
rewşenbîr û nûnerên partiyêne kurdî li
bajarê Helebê vexwendin civînekê; ji
bo şirovekirina vê pirsgirêkê. Civîn ro
ja 18'ê kewçêre pêk hat.

Babetêne civînê ev bûn:

Astengîn li hemberî zimanê kurdî;
rewşa pirtûkxaneaya kurdî (ji 6 salan û
vir de û cureyên pirtûkên ku hatine
çapkirin) li Sûriyê çi bi kurdî û çi jî bi
erebî; rola partiyêne kurdî di pêşvebirî
zimanê kurdî û kêmasyîn wan ên
di vî warî de.

Di axaftinê de hinek ji besdaran, li
hêzîn siyasi yêndî kurdî tawanbar kirin di
warê astenga zimêne de û hinekêne din jî
şer ajotin ber bi partiyêne kurdî ku ew
berpirsîn vê lipaşmayînê ne.

Nûnerên partiyêne wekî Yekîti, Hevgirtina Gel û Demokratêne
Pêşverû, ji besdaran re ronî kirin ku hebûna partian
di civaka kurdî de şana şaristaniyê ye,
ji ber ku hêzêni siyasi yêndî kurdî ala
mîletê kurd û hebûna wî, di hemû waran
de hildigirin; ji bo vê yekê xebatan
ji dikin û qelenê wê didin.

Nûnerên partiyan dan xuyakirin ku
hêzêni kurdî pêşeng in di vî warî de, ji
ber ku parastina zimanê kurdî û pêş
keftina wî yek ji rîbazan sereke ye.
Her wiha nûnerên partiyan ji hêleke
din ve hinek li besdaran rexne kirin ku

li şuna ku ew siyaseten erebîkirin, tirkîkirin û farisîkirin protesto bikin, ber
rê xwe didin hêzêni kurdî û ev jî tengni
hêrîne van kesan e.

Nûnerên partian ji besdar û rew
şenbiran re, hindek ji xalêñ hevbendi û
hevkarîye pêşniyar kirin:

-Komele, komik û dezgehêñ rew
şenbirî girîng in di jiyana çand û tore
ya kurdî de, nemaze di warê parastina
zimêne de û xebata wan di vî warê de
hêzêkê dide partian ku xebatêñ xwe
gur bikin bo pêkanîna armancêñ xwe

-Rewşenbîr divê gotar û afirandinê
xwe di belavok û weşanen partian û
rewşenbirî de biweşînin û alîkariyê
bikin di karê belavkirina wan weşanen
de

Kûrsêñ hînbûna zimanê kurdî vekin
ji kesen ne xwendevan re, li kîleka çal
akîyêne partian ên di vî warî de

Şermezarkirina projeyê rejîmêñ ku
siyaseten erebîkirin, tirkîkirin û farisî
kirin dimeşînin, bikin û tiliyên xwe
rabefî wan rejîman dirêj bikin, divê ew
dev ji siyaseten xwe yêndî qirêj û ne
mirovane berdin.

Li dawiya civînê, besdaran soz da
nîn ku ewê careke din civînê wilo
fîrehtir bikin di vê riya durist û rewa de.

Hinek ji besdaran li ber çavan, ev
bûn: Jan Dost, Helim Yusiv, Deham E.
Fettah, H. Gundî, Bavê Hozan, M.
Hemo, N. Hebo, Şergelê Kurd û Bavê
Viyan.

ABIDÎNÊ KARDUXÎ

Ew a ku hûn jê re mirin dibêjin, ma ci ye?..
Di çavêñ me de bi qasî xinizeki biçûk e
Û baweriya me ya bi serkefinê s
Bi qasî mirina bêmirin mezîn e.
Ew desteyek gu! bûn
Di kirêtiya bi hezaran xiniziyan de
Mistek berxwedan xweşik kirin
Hêj her tişt bi dawî nehatibû
Devlikan xwe avêtin nav tuşana zilmê.



Berwar (Sunay) İzol
1973-1993

Li ser navê malbata wê
JIYAN Û BERKEN İZOL

TÎSK

LERZAN JANDIL



Yadê Yabo...!

Sera 1966'î hardierzî ra dime ma berdîme Mardin, mektebê yâtî. Sebeta ke
ma çê xo ra, dewa xo ra rîya verî veciyâime, ma û piyê xo rîya verî ca ver
day bî, her çî ma rî ebi ters û xof bî. Ebi şewe nê ters û xofê ma tayîna
biyene eşkera. Wunciya yew şewe derezayêde mi hewn de karoliye diqatî ra gina
waro. Şîr û şîwarê dê de ma bîme heşar. Derezayê mi qêreno: "Wê Mehemed, wê
Gulê (r.i û mayê dê wê), wê kalik, pîrikî bîrê cinawiran ez werda. Wê bêrê şîma
kotî nîendî." O haybiro de ma lemba fişte ta, deraza hard de wertê orxanî ra vet.
Xîzke xîzka derazayî wa. Qalê dewe, ma û piyê xo keno.... Nê meseleyê niyanenî
tim amêne ma ser de.

Bê guman çiyêde niyanenî serê her kesî ra derbaz biyê. Û tam jî no dem de
mordem ebi zonê/ziwanê xo, ebi zono ke mordem xo tede bawer vîneno, veng
dano, tersê xo ano re zon. Sebebê na jûye/yewe zaf ê. Sebebo muhîmîrî ow o, ke
mordem hetê psîkolojî ra ebi zonê xo, û ebi kesanê ke dînan de no zon qese keno,
domantiya xo ra nat baweriyi ava kerdê. Yanê bi kilmiye; ebi kesanê xo yê nasan,
(ma û pî) û ebi zonê nê kesan bawer o.

Naye re jî eke doman berbono, ha layik ha çeneke, bê guman verde venga dayî
ka xo û yan jî bavikê xo dano. Nâ vengdayene yan jî no hawar ebi zonê baweriye,
yanê ebi zonê dayik êno re zon....

Emser ebi xîlê zamet, qal û qirî ma Berlin de yew cayê domanan "Kinderladen-
dikanê domanan" kerd ra. No ca seba domananê 3 hetanî 6 seran o. Angorê kon
septê nê cayî, yanê armancê ma, ganî domanî naca bişikiyo, ke hem zonê dayika
xo, hem edetanê xo bimusû û hem jî almanî bimusû. Kaleka naye de edet û kultur
anê bînan jî bişinaso.

Yanê armancê rakerdena nê cayî o bî, ke 1- Doman ganî zonê xo bimusû avê
bero, edetanê xo bişinaso, ere dînan wayîr veciyo, 2- Kaleka nînan de ganî zonê
almanan, edetanê dînan jî bîmusû. Çimke naca wertê nê şarî de ro û nacâşo
mekteb, 3- Ganî kulturanê bînan jî bişinaso dînan re humret xo nîşan bidêro. Bi
kilmiye doman gani ere xo bawer bo; sosyal bo, cemati ra durî mekuyo; tolerant
bo.

Nê cayî ra bê guman zafêrî domananê Kurmancan feydê diyêne. Çimke hetanî
nika îmkanêde dînana niyanenê zaf kêm biye. Berlin de tek yew taxe de îmkanêde
niyanenê biye. Hama ewro domanê ma şîkînê taxêde bîne de jî zonê xo qesê bik
erê û bîmusû.

Demo ke ebi nê armancî tenê çeyê kurdan amê û domanê xo qeyd kerdî, ez zaf
biyanê kîfweş. Rîye bifikirê bê ters, bê xof ez û domanê yewbînî de zonê xo,
yanê zonê yewbînî qese kînime. Ê mi ra, ez dînan ra fam kena.

Ebi na hêviye domanî roja verî amêy. Sebeta ke ma û piyê dînan lewê dînan de
bî kes nêberba. La belê roja didinê demo ke ma û piyê dînan şî, tayê domana dest
kerd ci berbayî. Nê domanan ra di hebî jî kurmanc bî. Hurdmine dest kerd bî ci,
vatene: "Yadêê, yaboo werin min bibin mal. Ez dixwazim werim mal....."
Mi o miyan de hem domanî kerdene hastî û hem jî ez fikriyene; "Na des seriyo ke
mi qe domanêde kurmanc nêdî bî, ke ebi zonê xo biberbo. Hama ewro verê mi de
di domanî ebi zonê xo berbenê. Ciqa demêde rind"

Bêrîvan



Xêz: Nihad Turk

Birayê delal, këmasiya yekemîn ev e ku wî xwendina xwe qedandiye û li xwendina min nebûye xwedî, ya duyemîn jî ev e ku çawa xwe xwendevan dibîne û keda her sê xwişkên xwe da bi qelenê min û ez kirîm wekî ku çèlekekê bikire û bêyî şewra min û bi keda xwişkên xwe, ew keda wan a ku bixwîn û xwîdana xwe dane hev, ci bi liqata pembû û ci ji aşêfa nav werzan!..

Bavê Bêrîvanê, piyê xwe û serê xwe bi hev û din re di deriyê xaniyê xwe re derbasî hundir kir. Piştî ku qama dirêj hin jê tewand û pê re pê re dengê wî hat ku bang li dayika Bêrîvanê kir. Qama dirêj dîsa rakir û li hêviya bersiva wî nema, heya ku dîsa bi dengekî qeba got :

– İro wê mîvanê min bêñ, rabin firavîna wan amade bikin!..

Dayika Bêrîvanê bi dengekî nerm jê pirsî:

– Her roj mîvanê me têñ, lê iro wê kî bêñ heya ku tu wilo li ser firavîna wan bi lez ketiyî?!

Bi dengekî bilind, bavê Bêrîvan bersiva wê da û bizirt got:

– Wê kî bêñ... kî bêñ, pismamîn me yêñ ji gundê Nisranê ne, Bêrîvanê ji min dixwazin û wê iro bêñ ser şîraniyê!..

Dayika Bêrîvanê vê carê dengê xwe bilind kir û disa pirsî:

– Ev li ku hûn li hev û din hatin û em pê nehisiyane!?

Bavê Bêrîvanê dengê xwe kir û bi hêrs got:

– Hûn ci ne.. hûn ci ne heya ku hûn pê bihesin!... Tişte min got û min ji dayika kurik xwest, qîma xwe pê anî û kurik jî bi tena xwe ye, bi tenê û sê xwişkên wî hene û bavê wan jî çûye rehmetê, ya pêwist ew e ku kurik xwendevan û aqilmend e û hûn ci êdî dixwazin haaa..?!

Dayika Bêrîvanê bi dengekî melûl jê pirs kir:

– Ma ci xwendin kiriye..?

Bi hêrs bavê Bêrîvanê qîr da û gotina wê birî û got:

– Ez ji ku zanim ci xwendin kiriye, dibêjin xwendevan e û çiqas tu karî pîrsan bikî!.. Rabe.. rabe çayekê ji min re çêke û bes pîrsen kelevajî bike!..

Mîvanê Bavê Bêrîvanê xwarina xwe xwarin û xatir jê xwestin, li ber derî mîvanekî jê pirsî: “Heger ku destûrê bidî, bila Serdar bê dergistiya xwe bibîne.”

Roja dî Bêrîvanê destê du xortan hejand û ew derbasî odayea mîvanan kîrin.

Serdar dostekî xwe bi xwe re anîbû û bêhxweşîya gulavê bi ser wan cilêñ nû de kiribûn. Serdar hatibû ku dergistiya xwe bibîne, lê heya ku Bêrîvanê qehwe ji ji wan re anî, wî serê xwe hilneda û li rûyê wê nenihêrt!..

Bêrîvan kenî û ji wan pirs kir:

– De, a niha ji min re bibêjin bê kî ji we ye yê ku ez xwestime..

Hevalê Serdar kenî û got:

– Bêrîvan, gerek tu zanibî kî ji me ye, li Serdar nîhêri, hema hema ji şer man hindik mabû bimira.

Di navbera henek û rastiyê de Bêrîvanê jê pirsî:– Serdar, tu ji min fedî dikî an ji xwe!?

Rengê Serdar hat guhertin û yê hevalê wî pê re û heya ku hevalê wî ji Bêrîvanê pirsî:

– Bêrîvan, bibêje bê çîma divê Serdar ji xwe şerm bike, ma ci kîmasî kîriye?

Bêrîvan bi dengekî nîzm axift û got:

– Birayê delal, kîmasiya yekemîn ev e ku wî xwendina xwe qedandiye û li xwendina min nebûye xwedî, ya duyemîn jî ev e ku çawa xwe xwendevan dibîne û keda her sê xwişkên xwe da bi qelenê min û ez kirîm wekî ku çèlekekê bikire û bêyî şewra min û bi keda xwişkên xwe, ew keda wan a ku bixwîn û xwîdana xwe dane hev, ci bi liqata pembû û ci ji aşêfa nav werzan!..

Dostê Serdar gotinê wê birîn û bi lez jê pirsî:

– Bêrîvan, tu ji ku xwişkên Serdar nas dikî?

Bêrîvan kenî û got:

– Xwişkên wî di sala borî û di roja alîkariya ARGK’ê de, tevlî xebate gel bûbûn û hin jînê kurd jî bi xwe re anîbûn.

Dostê Serdar qîr da û got:

– Ahaaa.. tu Apoçî yî ji ber wilo ji bavê te pir qelenê te biha xwest!..

Bêrîvanê bi hêrs bersiva wî da û got:

– Ez welatparêz im û roja ez bibim Apoçî, wê qelenê min ne ji keda jînê kurd be. Lê belê wê ji xwîna sor be!..

Dostê Serdar, xweziya wî di qirika wî de asê ma û li Bêrîvanê ma guhdar û bêyî ku tiştekî bibêje, lê çavêñ wî man beloq û wekî ku hezar pîrsî bikê.

Bêrîvanê axaftina xwe berdewam kir û got:

– Hevalê delal, malbata we qelenê min biha da, ji ber ku wan bi mezinati li bavê min nêri û bavê min jî ez biha firotim, da ku xwe li ser wê mezinatiye bihêle. Ya dawî ew e ku, ez ne di destê bavê xwe de me û heger hûn min dixwazin, divê hûn li gerflayan biggerin. Ew wê ji we re bibêjin ku ez di destê kê de me!..

Xort rabûn ser xwe û pê re pê re dosîtê Serdar got:

– Hevala Bêrîvan, sozê didime te ku ezê li wan gerflayan biggerim..

Ew cara yekemîn bû ku Serdar çavêñ xwe hildan û li nav çavêñ Bêrîvanê nîhêrt û bi kîfxweşî got:

– Bêrîvan, bayê te qelenê te pir kêm xwest, sozê bide min hevalê, tu bimînî ya min û heger rojekê em li ser çiyayêñ Kurdistanê liqayı hev û din hatin, em wê rojê bikin dîlan.

ABBAS. M. ABBAS

Kovareke li derveyî welêt: **DUGIR**

Dugir kovareke çand û hunerî ye; ji sê mehan carekê li Swêdê tê weşandin. Hejmara çaremîn a vê kovarê kete destê me, em dixwazin vê kovarê bidin nasîn.

Dema mirov bala xwe dide naveroka kovarê, tê tijî ye. Li pişt berga pêşîn, li aliye çepê yê logoyê wêneyê Mîr Celadet Bedirxan heye, di bin logoyê de jî tê diyarkirin ku redaksiyona kovarê li gorî alfabe, vekîte û rîzimanê Mîr Celadet Bedirxan çêdibe. Dema mirov bala xwe dide zimanê nivîsan, tê dîtin ku ew li ser soza xwe ne.

Kovar bi helbestekê dest pê dike, piştî wê jî jî nivîseke li ser helbestvanê kurd ê şoşeger Hamid Bedirxan heye. Di vê nivîse de M. Efif Huseynî û Ehmed Huseynî bi şêweyekî edebî Hamid Bedirxan di din nasîn.

Di kovarê de bi tenê mirov di xwendîna nivîsekê de tengav dibe ku ew jî nivîsa Hendirêna a bi navê "Nivîskarê kurd, çanda kurdî û pirsa nasnameyê" ye. Zimanê nivîsê xwandina wê dijwar dike. Li aliye din nivîsa Rezo Osê ya li ser "Xwedîkirin û Guhdana Zarokan" nivîseke hêja ye û mijareke girîng hildaye dest, bes nivîskar giraniya xwe daye nîxandina berhemî Ehmedê Xanî, "Nûbu-hara Biçûkan".

Di kovarê de cihekî berfireh ji nivîsên li ser Mele Ehmedê Namî re hatiye veqe-tandin. Ev nivîs di şeveke bîranîna wî de li Qamişloyê hatine pêşkêşkirin. Mirov bi saya van nivîsan vî ronakbîrê hêja ku

DUGIR



di kovarêne wekî Hawar û Ronahiyê de jî nivîskarî kiriye, ji gelek aliyan ve nas dike.

Di vê hejmara Dugirê de du çirokên ku bi kurdî hatine nivîsandin; çiroka Sîlêman Elî "Derdo Siyâsiye" û çiroka Şahînê Bekirê Soreklî "Xwekuştina nameyekî" hene. Wekî din jî du çirokên ku li kurdî hatine wergerandin di nava rûpelên kovarê de cih digirin. Yek ji van parçeyek ji romana Selîm Berekat a bi navê Perîk e, ku trajediya serhîderekî kurd i şikestî Mele Selîm vedibêje, ya din jî çiroka Xelîl Cibrân a bi navê "Goran bikolin" e.

Her wiha nivîsa M. Efif Huseynî ya der barê Cegerxwîn de û nivîseke li ser dewleta Merwanî ango Dostikî du nivîsên din in ku di kovarê de cih digirin. Ji bili van pexşanan du nivîsên rexneyî, hînek helbest di kovarê de hene. Ji van helbestan yek a Sebrî Botanî ye, yek jî ya Reşîd Bettê ye. Li ser berga paşîn jî helbesteke Angelo Santo heye.

S. BERBEYAN

Nivîsîna kitêban û erzanî...

Di nav gelên dînyayê de, belkî di nav kurdan de kitêb herî hindik têne nivîsîn, lê dîsa jî nivîsîna kitêban di nav kurdan de karekî herî erzan û hêsan e. Kêmbûna wan li aliye, dema mirov li kitêbên ku bi kurdî hatine nivîsîn dinêre, dilê mirov sar dibe. Yanê kêmbûna wan derdeke e, lê erzaniya yêneyî derdeke hîn girantir e. Ew kesen ku xwedî huner in bi zimanê biyanî dinivîsînin, yênu ku tu hunereke wan tune, nikarin xwe di zimanê biyanîyan de biceribînin, "berhem"ê xwe yêneyî giranbuha bi kurdî diafîrîn... Yênu ku xwedî huner in û dikarin bi zimanê biyanî jî binivîsînin û tevî hemû astengîyan bi kurdî dinivîsînin, ez bawer nakim ku ji tiliyê destekî zêdetir bin.

Em ci bikin? Ji bêsiûdiyêne me yek jî ev e...

Ü belkî bêsiûdiyekê birêz En.Ferhad Içmo ye ku dema min kitêbeke wî ya bi navê "Piştî çî!" dît, êdî nema min bixwe karî û ev gotin hatin der...(Ji bo ku li birêz En.Ferhad Içmo neheqî nebe, divê mirov bibêje ku "kitêb"ê jî yê wî gelek xerabtir jî hene.)

Birêz Içmo bi navê "Piştî çî!" kitêbeke şîrân nivîsandiye. Lî dema tu kitêbê dixwînî (ku bikaribî) tenê dizanî ku ev ji aliye birêz Içmo ve hatiye nivîsîn û di sala 1995'an de çap bûye û hew... Li kîjan welatî, ji aliye kîjan weşanxaneyê ve hatiye çapkirin, kes nizane.

Nîvî kitêbê bi daktîloyê hatiye nivîsîn, nîvî din jî bi kompîtûrê.

Ü şîr?..

piştî çî !

1995

Em ji şîrîn wî mînakan bidin:
"Ji peyala hêsrê yara

Mame..... bê.... par....,"

Şâîrê me bi hemû şîdetâ wan nuqteyan, tiyê hêstirêne yara xwe ye!.. De bila şîrîne bibîne, da ku kurd ci xwedî huner in!

"Payîza dil

Di nav xewna, nehat şuştin,

Bi omîda....,

Hêsrâ.. ewrê,

Zivistana.....,"


Lazim e şîr di nav wan nuqteyan de veşarî be... Dibe ku birêz Içmo dibêje; min di warê şekl û hûnandîna şîrê de pêşveçûn çekirine; kî dizane?

Tenê dikarim vî bibêjim: Mirov berhemîn xwe ji her kesî çêtir dizane. Dema mirov neecibîne, divê mirov çap neke, xwe şermezâr neke. Ü nivîsîna kitêban erzan neke.

R. DILOVAN

Li Kolnê tango!

FAYSAL DAĞLI



Kolnê bajarekî kevnare ye. Bajêr, wekî ku kapitalizm emir dike, cihekî firotanê ye. Xeyalfiroş, hevalfiroş, malfiroş, jînfiroş û hemû cureyên firoşkaran, êvaran di bin barên bêwîjdaniya xwe de dibetilin û ji bo berbangeke din ji xewêñ kûr hêzê distîn. Koln navenda endustriya hesin û pola ye jî. Kapitalizm; ku madenê der û dora wî bajarî kola ye, dîsa bi dest û tiliyê rûniştvanen vî bajarî, madenê û di hundîre mirov bajarî de ye jî, hêdî hêdî didize.

Li kolanê Kolnê ku bi kurdî tê xeberdan, dengfiroşek bi çiroka zembîlfiroş, hêvî û hesretê li birîndarîn dilan belav dike. Konferansvan, pêşkeşvan û berpîrsên profesyonel ên komeleyan, li quncikên meyxaneyan, bi seriyê xweş û bi-dilîn reş, tekstên xeberdana civîna sibê amade dikan û çav li gotinê orjînal digerînîn

ku, di axaftina xwe de bi kar bînîn.

Karkerêne biyan ên Kolnê wekî nexweşan ku coşa jiyanê ji wan hatiye dizîn, bêmade û bêhemdê xwe di quncikên kolanan de tevî xeyalîn xwe dimeşin. Şoşegerên kevn û penahendeyen nû, wekî maska tiyatroyê ku rûyek bi ken û yê din bi xem e, wekî cêwîkên bêbav, li meyxaneyan wekî hemalîn di bin barê xeyalîn xwe de, li hev dinêrin.

Koln, wekî xezaleke bihuştî ya wîndayî, di labîrenten mîjiyêni mirovan de yênu ku ne ji axa vî bajarî ne, baz dide û wan li pey xwe digerîne. Ê li pey xezalî riya xwe şâş dike, ji aliye bajêrê wekî ejderhayekî dev vekirî ve tê daqurtandin û li kuçeyan tê hûrkirin. Bi mehan û bi salan şûnde agahîyen li ser wî tê standin ku, dîn bûye an jî di cîhana reş de riya xwe wîndâr kiriye.

Cemê Ren piştî ku ji Kolnê derbas dibe, hîn qirêj dibe. Ren, wekî damarekê ku nexweşî û jahrî digerîne, bê jiyan û bê rîh di nav vî bajarî de diherike û berê rîwingiya xwe dide kûrahiya sîngâ Ewrûpayê.


Ü Dom, wekî du xencerên tûj ku xezeba yezdan temsîl dike ber bîjor ve hildikişê, dixwaze ji mirovan dûr here. Lî dîsa jî her roj bi sedan, bi hezarîn mirov ên bi gunehan lewîtandî û bi tîrsan şewitandî li ber siya Domê,

awîrên xwe didin ezmanan û ji Xweda lêborînê dixwazin. Piştî ku bawer dike, ku hatine efûkirin, laşen xwe yêne gunehkar, ji nû ve diavêjin nav behra serpêhatiyen Kolnê. Ev wekî lîstikekê didome...

Di rojîn derbasbûyî de em jî, ji bo Kongreya Yekîtiya Nivîskarê Kurdistanê li Kolnê bûn. Bi rasî kongreya Kolnê trajediya kurdan careke din anî ber çavan. Di şexsî nivîskarê Kurdistanê de bêmirâdiya qewmê me jî careke din hat fehmîkirin. Ji dehan nivîskarê kurd, tenê du sê duzîne gîhîstibûn hev.

Qelemsorêne kurd çîma necîiyabûn? Dema mirov guh bide hinekan ji wan paktir kurd û ji wan ezîtir kurdistanî tune ne. Di salonê Ewrûpayê yêne fireh û germ de, li hemberî nêr û mîyêni spî, êşen welatê xwe, wekî mişekî bêar li gel çepikên bi kompleks zanîn bifîroşin. Lî, rojekê ji kerema xwe re li hemberî platforma gelên xwe, rexneyen xwe, ramanen xwe, piştigirya xwe naynî ziman!

Li aliye din hînek jî, di nav çalakiya kurdistanî de wekî asît digerîn. Ji bo ku kêmâsi û birçîbûna rîh xwe têr bikin, fesadiyê wekî şûrekî bijahr dixebeitîn. Lî Kurdistanêne din tune ye! Çavê dîrokê vekirîye û li me dinêre. Ka ev tango, wê çawa bidome!



Ev jî para Mihemedikê min e

Pîra Surgicî, ji gundê Şatihê, roja inê bastêqan dibe bajarê Mêrdînê, ji bo firotanê. Dema nimêja xudbeyê ye, lê haya pîrê ji in û xudbeyê nîn e. Pîrê, li ber deriyê dikanekê derî-girtî buxçika xwe vedike û bastêqanli serê radixe. Pîrê çiqas çavêن xwe digerîne, li sûk û kolana bajêr kesekî nabîne. Dinihêre ku lawikek ber bê tê. Pîrê ji lawik dipirse:

- Kurê min ma qey kesek li vî bajarî nîn e? Tu bi Xwedê bikî ci bi vî bajarî hatiye?

Lawik dibêje:

- Metê, tiştek bi bajêr nehatiye.

Pîrê:

- Ji bo ci sedemî mirov li kolanê ba-

jêr nîn in?

Lawik:

- Pîrê, ma tuyê ci bikî ji wan?

Pîrê:

- Lawo li min bû dereng. Minê bastêqanli serê radixe. Dinihêre ku lawikek ber bê tê. Pîrê ji lawik dipirse:

- Metê, topek bastêq bide min, ezê bastêqê te bidime firotinê. Pîrê topek bastêq dide lawikê şareza, lawik bi destê pîrê digire û wê dibe hewşa Mizgefta Mezin; dibêje:

- Li vir rûne, gaveke din dê bastêqen te gişk bê firotin.

Pîrê buxçika xwe vedike, bastêqan li

serê radixe. Dema ku mirov ji hundirê mizgeftê dertên, her yek radihêje topek bastêq û "Yezdan pê re digihîne ber des-tê mirov", dibêjin û diciñ.

Pîrê dinihêre ku bastêqen wê gişk belas cûn. Kesekî tu pere mere nedayê. Topek bastêq li ser buxçika wê dimîne. Hema kuçen buxçikê lê dide hev, dixe hembêza xwe û bi dengekî dilsoj (dilşewî) dibêje:

- Lo lawo wele ev jî bila para Mihemedikê rain be. Mihemedikê min ji destpêka payîzê ve topek bastêq ji min dixwest, lê destê min lê nedigêriya. Ev jî para Mihemedikê min e... Ez nadim we...

İ. OMERÎ

Panzdeh ne bazde ye

R

ojekê, refek gerîla ji bo ku tetbiqatê bikin, derdi kevin derveyî wargehê.

Hê ew di rê de dimeşin, komutan hejmarê dixwaze. Hejmar ji yekê de dest pê dike û her wisa digihîje ye pazdehan. Ew jî ji yê paş xwe re "Panzdeh" dibêje. Yê panzdehan, "bazde" fêm dike, ew jî ji yê paş xwe re dibêje:

"Baz de."

Dema wisa dibêje, hema hemû gerîla li paş wî yeko yeko baz didin û xwe di nav keleman de vedişerin. Wekî ku ser derketibe her yek cihê xwe digire. Yê li pêş dimeşin, dema wisa dibînin ew jî, ji yê pêş xwe re dibêjin:


"xwe veşîrin."

Hemû xwe vedişerin. Komutan dibêje qey tiştek li paş qewimî û ji ber vê yekê gerîlayan xwe veşartine. Dixwaze hîn bibe. Bi fermanekê gişkan berhev dike, lê mîze dike ku gerîlayeki ji Başûre Biçük ji gotina "panzdeh" "bazde" fêm kiriye.

AHMET HUSEYN

BIXELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (40)



Bersiva Xacepirsa 38'an



Xacepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de ci bersiv
bigiliñin me, emê wan binirxînîn û
bi riya pişkê li 10 kesan belav
bikin. Xelata hejmara me ya 40'an
pirtûka

Dr. Kaws Kaftan

"Baban Botan Soran" e.
Jérenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin,
divê hûn "Peyva Vêşarî" di navâ
qufiyêñ li bin xacepirsê de binivisin
û tevi adresâ xwe ji me re bişînîn.

Kesêñ ku xelata xacepirsa 38'an, kasetâ Zilan "îro" qezenc
kirine. Berîvan Gurbet/ İzmir, Hasan Aslan/ Adana, Münür
Döger/ Amed, Kadî Can/ İzmir, Tuju Kuruöz/ Adana,
Abdullah Kadirhan/ Amed, Refîk Suvûcuk/ Amed, Egît
Doğan/ İskenderun, Bengî Falay/ İstanbul, Hakkı Yıldırım/
İstanbul



PEYVA VÊŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8

DİVREK

* Tırsa TC. yê nû; Jinen hemile
wê biteqin.



Hunera tîrkan ji vî şerî re mabû temaşevan...

Destpêk Rûpel 8-9

Piştî ku we film kışand û we lê temaşê kir,
we tê de ci kêmâsi dîtin?

O Ji ser vê filmê de sed sal derbas be û
em sax bin, hûn jî vê pirsê ji min bikin; dîsa
jî wê bersiva min her ev be:

Xwezî û sed xwezî min di destpêka filmê
de bikaribûya wêneyê wan pereyê ku li vî
şerî xerc dikin bi temamî bikişanda û eşkere
bikira. Lê mixabin ku îmkan tune bûn. Ji
xeynî kuştin û mirinê, ev ser ji her aliyî ve
welat didoşe, hemû çavkaniyên wê diçikîne...

Diyalog kurt û teng in; ev tercîha we bû,
an rewşa siyasi hûn girê dan?..

O Ev welatekî wisa ye ku yên mîna Ya-
şar Kemal jî de-
ma devê xwe
vedikin, du
gotinan
dibêjin,
wan di-
girin,
davêjine
hepsê...

Em li welatekî wisa filmê çedîkin ku hinek
kes dikarin ji bo gotinekê, filma te bişewitîni...
Dema ku film were şewitandin û ji ho-
lê were rakirin, bi temamî keda te bi avê de
dice... Min xwest ku riyekê wisa bibînim, da
bikaribim xwe bigihînime gel û min ev rê
dit. Li gorî min di vê rewşê de çêkirina fil-
meke wiha rast e.

Diyalog... Li vî welatî ji xeynî min, hemû
kes dizanin ku pirsgirêka herî mezin ci ye, li
ser ci tê axaftin û nîqaş li ser ci çedîbin. Ez
tenê destpêka diyalogan didim... Sûbayekî
tîrkan dibêje: "Hûn dixwazin, vî welatî par-
çe bikin" yê din bersiva wî dide: "Li hembe-
ri we doza geleki mafdar heye, em şopajoyê
vê doza mafdar in."

*Li gorî we, li ser sebebêñ derketina vî şe-
rî jî, lazim e film çêbin, an na? Hûn zêdetir
li ser encama ser sekinîne...*

O Muheeq divê li ser sebebêñ ser jî film
çêbin. Lê ev di vê rewşê de gelek zor e. Ev
wê di rojêñ pêş de çêbe... Ev heftê sal e ku rê
li ber hebûna gelê kurd hatine girtin, li ber
hebûna wan bend çêkirine.. İro teqiyaye...
Gelên vî welatî hemûyan bi hev re ev koma-
rê ava kirine; tîr, kurd, çerkez, arnawid,
laz...

Di destpêkê de dema qanûna bingehîn çê-
kirine, gotine: "Ev qanûna bingehîn û ev
parlemento yên gelê tîr û gelê kurd in ku
ev her du gel birayê hev in." Pişt re Qanû-
na Bingehîn guhartine.

*Yanê vî şerî ne di nav van
deh-panzdeh salén dawîn de, ji hef-
tê sal berê ve dest pê kiriye û tê...*

O Belê ev şerekî kevn e,
ne yê deh-panzdeh salan e.
Di vê dawiyê de, êdî kur-
dan ew bênda ku li pê-
şıya hebûna wan ha-
tiye avakirin, teqan-
din... Kes nikare li

pêsiya jiyanê
bendê çêbike,
ku çêbike jî,
wê piştî de-
mekê biteqe û
wê ew bi xwe
jî di binî de
bimînê. Dew-
letên herî bi
hêz mîna Brî-
tanyayê jî ne-
karîne, di da-
wiyyê de mecbûr mane rûniştine li ser mase-
ya aştiyê... Serkanê (Genelkurmay Başkanı)
me dibêje, ev kar bi riya diyalogê çenabe. De

**Tu santîmek bi vî aliyî ve werî
dewlet, bi wî aliyî ve herî PKK. Lî
tu naxwazî ku filmê te bibe yê
dewletê, an jî yê PKK'ê...**
Daxwaza te piştgiriya aştiyê ye...

ka ev panzdeh sal e te ci kir? Ew çend pere,
ew çend can, ew çend xwîn... Em li ser we-
latê xwe alê dadiçikînin, dibêjin; me ev çiya
zeft kir!

*Li gorî gotinan; hûn li ser projeyeke din
dixebeitin, mijara vê projeyê ci ye?*

O Projeyen min wê her li ser eş û jan û
pirsgirêkên gel, pirsgirêkên civakê bin. Ez
filmên evîniyê jî çebikim, wê tê de pirsgirê-
kên civakî her hebin. Filma ku ez dixwazim
çebikim, jiyana wan kesan e ku bar kirine û
ev welat ji wan re deyndar maye...

Jiyana kê û mijar ci ye?

O Büyera 12'yê adare û jiyana Deniz
Gezmiş... Ew mirovên ciwan, hezkiriyên se-
reke yên vî welatî bûn. Di nav listikên tarî
yeni vî welatî de, ew hatin daleqadin. Ú civa-
ka me ji wan re deyndar ma. Ez dixwazim bi
vî filmê deynê xwe bidim.



WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yaymecilik
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMÎ TAN
RAHMÎ BATUR

Berpîrsê Karêñ
Nîvîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimfînendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:

Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçük
49-5721-81360

München:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Brussels:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36



Em li hespê xelkê siwar bûne

**"Em tu carî dilê xwe bi axa xelkê,
bi welatê xelkê xweş nakin. Ev der çiqas xweş be jî,
ne li gorî adetên me û zanabûna me ye.
Hema ji çûn û hatina mirovên vir bigire,
heta rabûn û rûniştina wan,
danûstandina wan bi her awayî bi me xweş nayê."**

Ji gundê Xursê yê Qosera (Qiziltepe) Mêrdinê, sed û pêncî malbat di sala 92'yan de ji kuştin û şewitandin û talankirinê, bi kurtayı ji ber zilm û zordariya hêzên dewleta tirk dev ji mala xwe, rez û pezê xwe berdan, teví zar

û zêcên xwe reviyan û hatin Stenbolê; ketin nav-jiyanek nedîti û silav dane xerîbiyê li cihekî bi 15 km'yî dûrî navçeya Sariyera Stenbolê, Kîlyosê. Şaşbûn û neqayilbûna wan ji çavêwan dihat xwendin û wekî ku bibêjin: "Çi karê me heye li vê derê, em ci dikin li ser vê axa xerîb".

Ji sed û pêncî malbatan, sed û sîh û pênc malbat bi koçberî li bajarrê Tirkîyeyê yên mîna Mânisa, Mêrsin, Edene, Îzmîr û hwd. belav bûne û panzde malbat jî li Kîlyosê jiyana xwe didomînin. Zilamên wan di inşaetan de heqê nanê xwe bi emeleitiyê dertînin. Yek ji wan gundiyan Xalê Şikrî, wiha dibuje der barê hatina van malbatan de: "Wexta ku eskerên tirk êrişî gund kîrin, ci tiştîn me hebûn tev şewitandin û gotin, "An hûnê bibin qorîci an jî emê nehîlin hûn li vir bijîn" me jî ji mecbûrî kur û qahfî xwe yî ku şexsek karibe hilgire me bi xwe re anî, jê zêdetir jixwe me nekarî em bi xwe re bînin.



Zarokên koçberiyê dûrî welatê xwê, li welatê xerîbiyê jî ne rihet in û her li ber xwe didin

Em hatin vê derê (Stenbolê) lê ci hatin! Ev der welatê xelkê ye, ne welatê me ye. Ne dilê me pê xweş e, ne jî dilê wan bi me xweş e û em tu carî dilê xwe bi axa xelkê, bi welatê xelkê xweş nakin. Ev der çiqas xweş be jî, ne li gorî adetên me û zanabûna me ye. Hema ji çûn û hatina mirovên vir bigirê, heta rabûn û rûniştina wan, danûstandina wan bi her awayî bi me xweş nayê."

Têkiliya koçberan


Li Xursê cara yeke-mîn mala Xalê Şikrî hatiye şewitandin, piştî wê jî malên din... Xalê Şikrî piştî wê bûyerê lê dide û ji Xursê derdikeve û mîna koçberê yekemîn, tê li Kîlyosê bi cih dibe. Lê dema ku hêzên dewleta tirk malên gundi-yên din jî dişewitînin, ji mecbûrî hin ji wan malbatan jî tê Kîlyosê û Xalê Şikrî alîkariyeke mezini dide wan û heta dide koçberen ji gundê din re jî. Ji ber wê yekê ye ku Xalê Şikrî li derdorê xwe zehf tê hezkirin.

Xalê Şikrî nerazîbûna xwe ya vê derê û hesreta dilê xwe wiha tîne zîmîn: "Em her rój li hev rûdinin ka ev halê me wê çawa bibe, berê me li kurê ye, ev axa ku em li ser in ne axa me ye, ne ci-hê me ye. Em li hespê xelkê siwar bûne, rojekê wê ji me re bibe peyatî, emê li erdê bimînin û ne ku kîfa me jê re tê, jê hez dîkin. Belaş jî bidine me em nastînin, bi heqê xwe jî bidine me, dilê me li vê axê rûnane. Li çand û tore û rejîma vî welatî dilê me rûnane.

Her tim di xewna me de welatê me heye, axa me heye, mezelê me heye, tibeyen me hene. Her tim di xewna me de ew çûn û hatin, rabûn û rûniştina me heye, qêwmê me heye."

Bi koçberiyê dibistan

Koçberen xursî li vê derê ji xwe re nîvî ji naylon di tarzîn barakayan de çadir çekirine. Jin û mîr, kal û pîr, zar û zêc tey de jiyana xwe bi hev re û di nav hev de derbas dîkin. Yek ji hêviya wan jî ew e ku, zarokên wan herin dibistanê. Lî ji 150 zarokî ancax şes heb vêga dikarin biçin dibistanê. Ji ber ku



Xalê Şikrî baş bir dibe ku ci roj dibe bila bibe, wê rojekê vegere axa xwe.

dibistan bi saetekê dûrî Kîlyosê ye û çûn û hatin du saetan dikişîne...

Savaş jî yet ji wan zarokan ên ku diçin dibistanê ye, ew îsal hê diçê sinifa duyemîn. Diya Savaş jî zehmetî û tengasiya jiyana vê derê bi xemgîni diyar dike û dibêje: "Gundê me şewitandin û em mecbûr man ku werin van deran. Her roj însanên me yên walatparêz digirin dibin û dûv re laşê wan tê dîtin. Ji ber wê em li vir bi kesî bawer nabiîn. Serma çileyê bi taybetî zehf tehdîyedî de zarokên me, dest û piyêwan dice-midin, tê digirîn.

Em ci bikin dibistanê nêzîk tune ne û ji dêla ku bi erebeyê herin dibistanê û werin windakirin, em razî ne ku bi peyatî herin û werin."

Her çiqas îmkana wan tune be ku zarokên xwe bişînîn dibistanê jî, ew naye wê maneyê ku zarokên xwe ji binî vê bêperwerdehî histine. Malbat tev de bûne yek û çanakek standine, danîne nav çadirekê, bi riya program û bernamîyen MED-TV'ye, ji xwendin û nivîsandinê bigire heta muzîk û gelek tiştîn din hînî zarokên xwe dîkin. Ji saeta ku MED-TV dest bi weşana xwe dike û heta dawiyê, mezîn û biçûk lê temâse dîkin.

Ji ber koçberiyê ev însan ji hev dûr nebûne, berevajî bêhtir nêzîkî hev bûne û li hemberî astengî û pirsgirêkan jî piştî didin hev û zora gelek astengiya jî dîbin.